Muaviyenin Tahtını oğlu Yezide devr etmesi tüm arab dönüşünde bir memnuniyetsizliğe yol açtı.

Çoğu insanlar Muaviyenin takipçisinin alışığı gibi bir İslam şurası tarafından seçilmesini istediler.

Yazid sadece kitap ehillerine deyil diğer kurt-azınlıklarına dahil bütün serbestliklerini vermiştir. çoğu Kurtler o zaman Yezidi dininin mensuplarıydılar.

Kendi Vatanları İslame ordusu tarafından işgal edilmeden önce. Zorla İslamalaştırma kabul etmeyecekler katli ediliyorlardı.

Yazid azınlıklara karşı hoşgörülü davranmıştı ve bütün dini serbestlikleri onlara sağlıyordu.

Bu durum şamda Taht sahibiyle Yezidi-Kurtlerinin arasında bir dostluğa yol açar. Bunlar Hz. Peygamberin tarafına karşı bir kutup sağlıyorlardı. Her iki tarafta kendine dost edinmeye devam ediyorlardı. Yazid arab müslümanlar tarafından ve özellikle iraklılar tarafından hiç sevilmedi. Onun davranışları dinsizlik olarak görülmüyordu. Yezidilere karşı olan bu

hoşgörüsü yüzünden bir yakınlık hissediyorlardı bilemeyez. Bazıları annesi Meysunun bir Kürt-Kadını olduğu ve kendisinin kürteyi dahi bildiğini söyleyler. Yoks'a neden bu kadar türk yazılmış olsa gerek?

Yezidiler Yazid İbn Muaviyyenin Melek Taus tarafından zorla İslamlıtırlmadan korunduğunu inanıyor

Yezidiler onu yezidi-dinini kurtarıcı olarak görüyorlar. Yezidi Ayetlerinde Yezide insan gücünden daha fazla olağanüstü güçler var edilir.

"Kadi Şero" bunun bir göstergesidir.

Bu şarkının içeriği şöyledir: Sultan Yezidle o zamanın kadisini arasındaki ağız kavgası anlatılır ve şeriatın kadisi demektir.

zamanki islam dünyası ikiye ayrılmıştı. Azınlıklarda bu durumla karşı karşıyaydılar. Yaşayabilmek için taraf tutmak gerekiyordu ve tabiki kim daha iyi hoşgörülü ise ona gittiler.

Yezidi din adamı Şeyh Adı (m.s.1060) Yazid ibn Muaviyye hakkında müslüman hükümdarlar arasında en hoş görüleni olarak görmüştür. Tabiiki Hz. Peygamberin zamanı müstesna.

Islam hükümdarlarının azınlıklara karşı olan sempatisi tarihte çok rastlanmıştır.

Sufi Hüseyin el-Halajî, Taurus Meleğin teorisini savunmuştur. Bilindiğine göre bu teori sadece Yezidilerde bilinmektedir. Yalnız bu Sufi bir islam alımıydı.

Kendisi tutumunu hayatıyle ödemistiştir. Islam mahkemesi tarafından ölüm cezası verilir ve idam edilir.

Müslüman hükümdarlarla azınlıklar arasındaki vakâ günümüzze kadar devam etmektedir. 18.yy'in

ortalarına doğru kurt-Müslüman savaşçı Timur Paşa el Milli bütün kurt boylarını ,yezidileri de dahil kendi hükümdarlığı altına almaya sahip olmuştur. En iyi savaşçılardan olan derviş Avdi (Devreşe Evdi) yezidiydi.

Tüm bu örnekler gösteriyor ki, yezidiler islam baskısına karşı korunma patronelerine sahiptiler. Babil - Asur Kralı Nebukatnasser' de yezidilerin kutsall yazlarını yönetici, koruyucu ve kral olarak anmıştır. Bilindiği gibi, Emevi Halifesi Merwan Muhammed Mervan zamanının m.s. 750 de bitmesiyle Emeviler zamanında sona ermiştir.

Ebu Abbas'a Bağdatta Halifelik verildi. Emevi zamanının bitmesiyle Yezidikürtlerinin zorla İslamlıtırmaları da biraz daha artmıştır. Bu durum müslüman kurt Şeyhi Abdül Kadir Geylani'nin Irak'ta bir islam okulu açması ve takiplerin yasaklanması kadar sürmüştür. O, yezidilerin baskı yapılmadan ve kan akıtmadanda islamı tanrı-yacıkları ümidi sahipti. Bu durum uzun bir barış ve sessizlik dönemi getirmiştir. Bu gerçek "Kewle Şixadi" ayetinde de belirtilmiştir. Islam Şeyhi Abdül-kadir Geylani ve Yezidi şeyhi Adı arasındaki bu yakınlık tarihsel olarak belgelenmiştir.

Üzücü olan durum, Türkiye ve Arap ülkelerindeki inançlı kesimin takoz kullanarak değişik dinleri ve inançları kendi kontrollerinde daha iyi tutabilmek istemeleridir. Örnek vermek gerekirse, Hz. Ali'nin oğulları Hassan ve Hüseyin'in ölümünden yezidiler sorumlu tutulmaktadır. Burda şu ortaya konabilir:

Zamanın devlet yöneticisi (Damaskus'un) Mawiyeh Ibn Ebu Sufyan (m.s. 634) Peygamberin dördüncü ve son takipçisi Ali ibn Ebu Talib'i küçük savaşlara

sürükleyerek başa gelmek istemiştir. Halife Ali m.s. 660'ta Abdüllrahman ibn Meljem tarafından Cami'de öldürmüştür. Onun ölümünden sonra halifeliği büyük oğlu Hassan almıştır. Çok geçmeden O halifeliği bırakmış ve Muaviye'nin leyhine tahttan çekilmiştir. Muaviye'nin kendisini İslamiyetin Halifesi ilan etmesine karşı olarak Hz. Ali'nin küçük oğlu direnişe geçer. O, Muaviye'nin diz çökmesi için müslümanları mobilise etmemi denemiştir. M.s. 681'de Hz. Hüseyin ve ailesi hunharca katledilmiş ve Onun başı Damaskus'a getirilip Yezidilere verılmıştır. Bu soykırımı Emevi rejiminin yok olmasında dolaylı rol oynamıştır.

İşte bu kara gün, yani Peygamberin ailesinin katledildiği gün, Kerbela (Irak) daki şíiler tarafından her yıl yürüyüşlerle anılır. İşte bu gün "Aşure" günü olarak kabul edilir.

Bu politik motivasyonlu katliamlar ve diğer tüm kötü olaylar haksız olarak Yezidilere mal edilmiştir.

Bu Tarihi saptama, yezidilerin yüzyıllarca takip edildiklerini ve gözetim altında tutulduklarını gösterir.

Bu durumun bir gün son bulması için tarihi gerçekler gün ışığına çıkarılmalıdır.

Sonuç olarak

Bu yazının sonunda bazı soruları gün ışığına çıkartmak istiyorum ki, hiç bir şekilde Yezidiler Emevi Halifesi Yazid'in taraftarı değilidir.

Nasıl müslüman olabilirsiniz, eğer başka bir ibadete sahipsiniz? Nasıl müslüman olabilirsiniz, eğer başka bir Oruç tutma zamanına sahipsiniz? Damaskus'taki Eme-

viler ve Bağdat'taki Abbasiler arasında nasıl düşmanlık başlamış olabilir, eğer dört yaşam faktörünü Ateş, Hava, Su ve Toprağı' yüceltirseniz? Nasıl Yazid'in taraftarı olabilirsiniz, eğer ki ölülerinizi başka şekilde defnediyorsanız? Nasıl bir islam tarikatının taraftarı olursunuz, eğer güneş gökyüzünde Allah'ın bir işareti ve İslami onun önünde yüceltirseniz? Nasıl müslüman olabilirsiniz, eğer çok lağubali bir şekilde Hac görevinizi yerine getirirseniz? Nasıl müslüman olabilirsiniz, eğer hiçbir zaman başka bir inancı kendi içينize almamışsanız. Nasıl müslüman olabilirsiniz, eğer hiçbir zaman cehenneme ve kötü bir güce inanmıyorsanız?

Sanıyorum burada müslümanlar tarafından verilecek kabul edilebilir bir cevap yoktur. Ve:

Eğer yezidiler bir Islam dinine sahip olasalarlardı, neden o zaman tüm imkanlar kullanılarak zorla İslama zorlanmışlardır?

Neden onların kadınları müslümanlarla evlenmeye zorlanırlardır?

Bugünkü tarhi bilgisi olan yezidiler taraftar olarak eskiye bağlı, köküderinlere inenve islamdan önceki bir dine inanıyorlar, onların örf ve adetleri açık olarak islamiyettekilerden farklıdır. Sanıyorum bu yazımla kafalarda bir düşünce yol açabilmişimdir ki, bu tüm dünya ve özellikle islam aleminde yezidilerin islam olmayan bir dine sahip oldukları kanısını başlatır. Eşit hakların olduğu, temiz düşüncelerin çok kültürlü bir toplumda kullandığı bir dünya için, fundamentalist düşünce ve yazıların ortadan kaldırılması gereklidir, bu da yezidilerin beraberlik zamanıdır.

Der Religionsrat der Yeziden

Im Yezidentum gibt es den Rat der Würdenträger, der sich mit den religiösen und weltlichen Angelegenheiten der Yeziden befaßt und den zukünftigen Weg des Yezidentums festlegt.

Mitglieder des Rates der Würdenträger

1. Mir (Fürst von Scheikhan)
2. Baba Sheikh
3. SheikhWezir
4. Peshimam des Fürstentums
5. Peshimam des Baba Sheikh
6. Naqib
7. Baba Gavan
Behüter der Heiligtümer
8. Führer der Qewals
9. Baba Tschawisch
10. Torwächter des
Sheikh-Adi Tempels

Bei Themen, die alle Yeziden betreffen bzw. von grundsätzlicher Bedeutung für die Yeziden sind, nehmen auch Stammesführer, Diener und Betreuer von lokalen heiligen Orten (Ziyaret) an den Sitzungen des Rates der Würdenträger teil.

Die Mitglieder sind verpflichtet in der Nähe von Lalish zu leben.

Aufgaben der einzelnen Mitglieder

Mir - Der Fürst von Scheikhan

Das Wort Mir ist kurdischer Abstammung und bedeutete ursprünglich Sonne. Der Mir ist das uneingeschränkte Oberhaupt der Yeziden. Als rechtmäßiger Vertreter von dem yezidischen Reformator Sheikh-Adi gilt er bei den Yeziden als heilig. Seine Person ist unantastbar. Der Mir wird ausschließlich aus den Mitgliedern der Mir-Familie ernannt und regiert auf Lebenszeit. Seine Haupt-

aufgabe ist es, die Yeziden vor allem in weltlichen Fragen zu vertreten. Seine Entscheidungen genießen bei den Yeziden absolute Autorität. Der Rat der Würdenträger unterliegt seinem Vorsitz. Die Mitgliedschaft im Rat bedarf seiner Zustimmung. Er legt nach Beratschlagung im Rahmen einer religiösen Zeremonie mit dem Rat und yezidischen Persönlichkeiten den Baba Sheikh fest und bestimmt ebenfalls über die Vergabe weiterer religiöser Ämter. Die Verwaltung von Lalish wird von ihm geführt. Er residiert in Ba'adre, das ca. 20 Kilometer von Lalish entfernt ist.

Baba Sheikh

Der Baba Sheikh ist das geistige Oberhaupt der Yeziden und symbolischer Vater der Sheikhs. Er muß Angehöriger der Fakhradin-Sheikhs sein. Diese Scheikhs-Familie ist eine Abteilung der großen Sheikh-Familie der Shemsani-Kaste. Die Fakhradin-Sheikhs spielen seit jeher eine bedeutende Rolle im Yezidentum und sind für ihre sehr guten Kenntnisse über das Yezidentum bekannt. Der Baba Sheikh beherrscht alle Qewls (religiöse Texte) und ist der höchste Ausleger der Religion. Er beschäftigt sich mit dem religiösen Leben der Yeziden. Jährlich besucht er yezidische Dörfer und vermittelt den Menschen, wie ein yezidisches Leben zu führen ist. Er ist für die Ausrichtung der religiösen Feste in Lalish verantwortlich.

Sheikh Wezir

Er ist der Vertreter der Shemsani-Sheikhs in Lalish und muß auch aus deren Familie abstammen.

Civata Rûhanî

Civata (Meclisa) Rûhanî ya Êzîdiyyê hat ava kirin, da ku pirs-girêkên oldarî û birêvebirna kar û barên cîhanî di nav Êzîdiyan de çareser bike.

Heke Civata Rûhanî li ser karekî anjî li ser pirsgrîkeke ji bo hemû Êzîdiyan civîna xwe bike, hingê micêwîrên ziyaretên gundan û serekîl jî dikarin li vê civînê besar bibin. Ji her endamekî vê civatê tê xwestin, ku mala wî nêzîkî Lalişê be, li mergehê.

Endamên Civata Rûhanî ev in

1. Mîrê Şêxan
2. Extiyarê Mergehê (Bavê Şêx)
3. Şêxê Wezîr
4. Pêşîmamê Mergehê
5. Pêşîmamê Bavê Şêx
6. Neqîb
7. Bavê Gavan
8. Serokê Qewalan
9. Bavê Çawîş
10. Serderiyê, anjî Feqîrê Mala Şîxadî li Lalişê

Wezîfe û ritba endaman

Mîrê Şêxan

Gotina Mîr gotineke kurdi ye û ji gotina mîhir hatiye. gotina mîhir jî anku roje ye. Mîrê Şêxan Serokê vê civatê ye. Ewî bi tenê maf heye, ku bîyar bide, kî bibe endamê civata Êzîdiyan. Wekî din jî ew e, yê ku Bavê Şêx hildibijere. Bê guman ne berî şêwir û gotina endamên civatê û serekîlê Êzîdiyan. Pêşniyazbûna Bavê Şêx bi şeweyekî tevayî pêk tê, lê Mîr her gotina dawî dibêje û bîyarê distîne. Ew kar û barê rîexistinî li Lalişê dike û hec û micêwîrên xasen Êzîdiyan destnîşan dike. Gera Tawisê li nav

Êzîdiyan bê destûr û bîyara Mîr çenabe. Bi kurtî: Mîr Serok û berpirsyarê birêvebirna kar û barê tevayî ye. Ew her ji bo hemî Êzîdiyan serok û rîber e û li Lalişâ Nûranî ew wekîlê Mala Şîxadî ye. Ji Mîr tê xwestin, ku weke rojê rîya Êzîdiyan ronahî bike û her li gor navê xwe i bi xelat, nûr û nezer be.

Extiyarê Mergehê (Bavê Şêx)

Ew pewîst e, Extiyarê Mergehê ji malbata Şêxên Fexredînan be. Şêxên Fexredînan bavikek ji bavikê Şêxên Şemsaniye ne. Ji ber ku Şêxên Ferxedînan di dîroka Êzîdiyan de roleke pir mezin û girîng listin û pewîst bû, ku ew hemî qewlîn Êzîdiyan zanibin, lewma Bavê Şêx ji nav rîza wan tê. Bavê Şêx serokê oldarî (rûhanî) ye. Ew guhdanê li avaniyê Lalişê û qubêن xasen Êzîdiyan yên li gundan dike. Pêkanîna cejnîn olî ew dike. Helal û heramkirin bi desten wî dike. Bê guman ew vî tişti bêyî gotin û şêwra Mîrê Şêxan û Civata Êzîdiyan nake. Pewîst e, ku Bavê Şêx her sal li gundan Êzîdiyan bigere û her şev li gundekî bimîne. Armanca vî karî jî ev e, ku şîreta li wan bike û rîya rast bide ber wan.

Şêxê Wezîr

Ew ji bavikekî Şêxên Şêsimsan e. Şêxisn Şêxê qelemê bû, Şêsimş wezîr û meferê millet bû. Lewma Şêxê Wezîr pewîst e, ku ji malbata Şêsimşan be. Ew serwerê mala Şêsimş li Lalişê ye, endamê civatê ye û semakêse Mala Şîxadî ye.

Pêşîmamê Mergehê

Ew ji Şêxisnan e û di ger û pîrozkirina semayiyê de dikeve pêsiya Mîrê Hecê. Ew mehra xort û keçen bixwazin bizewicin dibire.

Pêşîmamê Bavê Şêx

Ew ji malbata Şêxên Şerfedînan e. Çaxê cejna semayiyê û gera nava gundan Êzîdiyan ew dikeve pêsiya Bavê Şêx.

Neqîb

Ji bavikê Pirêن Haciylan e. Heta berî sed salekî Neqîb ji mala Şêxên Şêxsina bû. Wezifa wî ji ev e, ku bi qewalan û Tawisê re bigere û xurcika Tawisê bixe stuyê xwe û Tawisê siwar bike û bi Tawisa mergehê re bigere.



Bavê Çawîş

wêne: G. Prieß

Bavê Gavan

Bavê Gavan ji Şêxên Amadînan e. Ew endamê civata Bavê Şêx e û çaxê Bavê Şêx li nav milet bigere, ew di coqeta Bavê Şêx de ye.

Mezinê Qewalan

Ew ji eşireta Dimilên Zerzan e û hem mamostê olî hem jî serokê qewalan e. Ji wî re ferz e, ku Qewal li cem wî xwe hînî qewlan bikin. Pewendiyen wî bi Mîr re hene. Ew xêrên Tawisê dicivîne.

Bavê Çawîş

Ew piranî ji bavekekî pîran e. Wezifa wî ye, ku çavdêrî û guhdariyê li Laliş û geliyê wê bike. Ew jî bi xizmetkarên din re xizmetê dike û besdarî semayê dibe.

Formûlara darbaviyê ya oldarî ji bo mirovên Êzîdî

Geli xwûşk û birayêñ birêz!

Wekî her oleke miletên cîhanê ku ûrf û edetên xweyî cûde hene, yên ola me Êzîdiyan jî sed û hedêñ me hene.

Ev sed û hedêñ me kengî, ji ali-yê kî, di kîjan rewşê û şiklîde hatine afirandin û çewan bi me hatine qebûlkirin?

Li ser bersivan van pirsan, gelek niviskar û rewşenbûrîñ Êzîdî, kurd û gelêñ dinê, li goriya lêkolînêñ xwe nivisandine. Ez naxwazim iro li ser van bersivan biseknim.

Lê, bi dîtina min çiqas li ser Êzîdiyatîyê hatibe nivîsandin jî, hêjan jî gelek ûrf û edetên me hindan e û me gelek jî kovikirine. Ji bo kû em vanê iro heyî baş nasbikin û vana jî kovî nekin, min li ev darbava Êzîdiyatîyê bi rêz kiniye. Ez hêvîdarim, her xwendevanekî Dengê Êzîdiyan ku vê hêjmarê bixwîne, wê karibe vê darbava Xwedanê xwe, li ber van pirsan, bersivan bide û kopyiekê ji vî rûpelî çê bike û ji bo xwe dagre.

Gava em van bersivan iro rast binivsînin û di quncekî malê de biparêzin, anjî bi devkî ji hevûdinre wekî gotinê bav û kalan bibêjin, wê pêşeroja Êzîdiyatîya sibê ji ya îron hîn ronayîteribe.

Ez bawerim wexta hûn kopyiekê ji ber darbava xwe ji Dengê Êzîdiyan re, ji bo arşîfa wan ji wan-re bişînin ewê jî gelekî dil-xweşbivin.

Dîsa jî hûn dikarin fîkrêñ xwe li ser vî babefî ji bo min li ser navníşana kovara Dengê Êzîdiyan bi rê bikin. Ez ê gelekî pê kêfxweş bivim.

Dema we xweşbe!
Bavê Şêran

1. Nav û Paşnavê te çiye? _____
2. Mala we li welat li kur bû? _____
3. Xwedanê we kiye? _____
4. a) Navên Şêxên we çiye û ew ji kîjan.
b) Eşîrê ye? _____
c) Malbatê ye? _____
d) Binemalê ye? _____
5. a) Navên Pêşîmamîn we çiye û ew ji kîjan.
b) Eşîrê ye? _____
c) Malbatê ye? _____
d) Binemalê ye? _____
e) Mala wan li Welat li kur bû? _____
6. a) Navê Pirê we çiye û ew ji kîjan:
b) Xwedanî ye? _____
c) Eşîrê ye? _____
d) Malbatê ye? _____
e) Binemalê ye? _____
f) Mala wan li Welat li kur bû? _____
7. a) Merebiyê we kiye û ji kîjan:
b) Xwedanî ye? _____
c) Eşîrê ye? _____
d) Malbatê ye? _____
e) Binemalê ye? _____
f) Mala wan li Welat li kur bû? _____
8. Bira anjî Xuha te ya Axretê ji kîjan xwedanî ye? _____

Qewlê Qendîlan

Zênar e, Zênar e
 Şixadiyo me bi te heware
 Bedîl li me buye kifare

Bedîl hatin û bîbirîn
 çendî tê de difikirîn
 Di nav de mabûn heyîn

Bedîl dihatin û diçûne
 Kêm bûn alîm û xetxûne
 Lewma ji yek û dû berî nasbûne.

Hûn bifikirin bi bedîlan
 Guhê xwe bidne xafilan û bedîlan
 Lew ronahî ji nav me rabû çû qendîlan.

Çi qendîleke bikir
 padîşaê min bi rehim û şefeqet xwe kir
 Ewî jê çêkir Şêxûbekir.

Çi qendîleke zer e
 Nazil bû ji erşê li ser e
 Şêxûbekir buye merebiyê Şêşimsê teter e.

Çi qendîleke nûrîne
 Dahir bû ji ezmêne
 Şêxûbekir buye merebiyê Şemsedîn û Ferxedîn e.

Çi qendîleke girane
 Nizil bû ji ezmane
 Şêxûbekir buye merebiyê her çar birane

Çi qendîleke ges e
 Nazil bû ji erşê
 dergevan Şêx Fexrê reşe.

Çi qendîleke mezin e
 Rehim û şefeqeta padşê mine
 wî jî çêkir Melik Şêxisne.

Melik Şêxisn dibêje wekê dinya av bû
 padşê min yî li nav bû
 ew kî mîr li ber rawestiye bû.

Mêran ji Melik Şêxisn pîrsiye
 Ew Şêxisnê ibn Adîye
 Te zerib û hiner û kerametên padşê xwe te çawa diye

Şixadî hate Hekare
 Sicûde bû ber û dare
 Şixadî li nav mîran serdar e

Şixadî hat Lalişê
 Xemîlî bi xerqê reşe
 Edewiyan hal pê xweşê

Şixadî li Lalişê bû
 Xemîlî bi xerqê reş bû
 Edewiyan hal pê xweş bû

Ev dinya, dinya ke zer e
 Însanê têde bê bawer e
 Mefera me ma Şêşimsê Teter e.

Wa dibêjin Melik Şêxisn Adî
 Min zeribû hiner û kerametên padşê xwe zav dî
 hemû caran bi navê Siltan Şixadî.

Ji qewlî Şêx Fexrê Zergûne
 Pîrs bikin ji melkê beyrûne
 Gelo çawa ev ezman rawestiye bû bê stûne

Melik Fexredîn wa dikire raye
 Ewî û her çar biraye
 vêkra dîkin tebaye
 Digot: Stûna ezmêne rawestiye bû bi du'aya

Ev dinya dinya ke mezin e
 Kêm bûn alîm û momin e
 Mefera me ma Melik Şêxisn e

Ev dinya, dinya ke bi cîd e
 Xof û rehim nema li dilê mirîde
 Mefera me ma Siltan Ezid e

Bedîl bûrîn min wiha dî
 Dê dahir bibe Şerfedîn il mihdî
 Mefera me ma Siltan Şixadî

Ji qewlî pîr Reşê heyrane
 Hinciyê bi rastî û diristî dest
 Pavête damana yar û birane
 Dayîm merkeba wî li behrêne giran ye melevane

Ji qewlî pîr Reşî bi cîd e
 Dibêjime we gelî mîrîda
 Me dîn Şerfedîn e, etqat Siltan Ezid e

Em kêm in, Xwedê yî temam e.

Berhevkirin: Bêdel Feqîr Hecî

Ji Qewlê Ezidiyan

Qewlê Xerqe

Berî dinya nebû
Wê rojê Xerqe hebû
Xerqe libsê Xwedê bi-xwe bû.

Dinya nebû nedisêwirand
Mehbet hebû mîran nedî'inkirand
Wê rojê Siltan Şîxadî xerqe dehirand

Dilê min bi vê yekê muhtac e
Çi derwêşekî rehwanc e
Berkirina Siltan Şîxadî delq e û tanc e.

Tanc dibêje xerqeye
Rojê sed gunehkar têne ber damana te ye
Heqiya Şîxadî destekî ma li ser te ye.

Wê dikilimîn girîvan e
Xerqe libsê padşeyekî min yî giran e
Xerqe qubleta xasan e.

Xerqe libsê Xwedê bi xwe ye
Êwirye ser qalibekî beyteşe ye
Wan xêr nedikirin guneh li xwe dikirin zêde ye.

Xerqe libsê cebar e
Henciyê hilîntê ser Xerqê Şîxadî dar e
Li axretê li her Şîxadî û Melik Şêxsin yî kafir û
gunehkare
Hençiyê bi surma xerqe bigre
û bi xezeb té de bifikire
Ew bê şik dê kafir bimire.

Xerqe libsê nuranî
Ji xezîna qudretê deranî

Divê mîvan xatirê Xerqê Şîxadî bizanî.
Xerqe libsê mîrê axe
Heçiyê dibin barê xerqe de neke kul û emelê saxe
Roja axretê yî tazî ye, yî çîplax e.

Xerqe libsê xas e
Çûne behrê xweas e
Lal û dir anîn bê qiyas e.

Çil qîzên behrî bûn
Her cil yî horî bûn

Her cil nedrê Kaniya Sipî bûn
Yeke din li wê ma bû
pîr sînî behrî yê peyda bû
Ew jî nedra padşa bû.

Ji qewlê lawikê pîre
Da em bidin medhîn mîre
Xelatê Siltan Şîxadî xerqe ye
Danîbû ser milêñ feqîre.

Di'a dûpişk û mar

Axler, axlebî
Carînurîçîqîlî
Di wirde û di kurd de, di xîbeta Resûl de
Şêxmendî Feqrân e
Pîrê Cerwan e
Heke dûpişk e
Heke mar e
Di serî de bike hefsare
Berde çol û çolbeyaran
Heya em sibê bibin hişyar e
Û roj li me bibe diyar e

Di'a Nezerê

Ya sitar ya cebarn ya efan ya emîn
ya xundekarê ber û behir
Ya xalîqî leyîl û nehar
Ya rebî ismek sitar

Berhevkirin: Bedel Feqîr Heci

Tebîni

*1) Xerqe gelek li cem Ezidiyan pîroz e û herkes nikare barê Xerqê hilgire. Lewma jî Xerqe libsê dêwrêş û xizmetkarên Mala Şîxadî ye.

*2) Ev di'a ji bo xweparastinê ji dûpişkan û maran té gotin. Teslima mara bi destê şêxên Şêx-Menda ye, Teslima dûpişkan bi destê pîrén Pîr-Cerwana ye. Dema mar bi yekî vede qesta

şêxen Şêx-Menda dike, şêx jî bi destûri xwedanê xwe birfîna wi çare dike. Yen dûpişkî jî pêvê dayî qesta malîn Pîr-Cerwan dike.

*3) Ev peyvîn di'ayê sê caran têne gotin bi karanîna beratekê anjî hêkekê û gerandina wê sê caran li ser serê mirovê nezergirtî.

Qewal - Sembola dilpakiyê û parêzerên dînê Ézîdiyan

Lêkolîneke oldarî-zanistî

Dr. Xelîl Cindî

Di vê nivîsara xwe de ez geleki miqat im, ji ber ku mirov çiqas bi başî di derheqa xizmeta dîroka „qewalan“ de ya ji bo parastina kelepûrên dînê Ézîdiyan, tor û tibetên wan bibêje jî, disa jî her kêm e. Van ciwanêran bi emanet û destpakî mîratê babkalkêne me, felsefa dînê Ézîdiyan, edebê devkî, cejn, û hwd. bo me parastine û gehandine roja iro. Ji bo vê çendê ez dikarim bibêjim: „Qewal gûlên rengîn yên baxçê Ézidîtiyê ne, sembola xweragiriyê û ava zelal ya serkaniya bîr û baweriya Ézidîtiyê ne.“

Gotina „qewal“ji ku tê?

Heya demeke kin û belkî heya niha jî li gorî dîfîna hinek kesan gotina „qewal“ ji bêja Erebî „qale-qewl“ tê, lê li pê hinek vekolînan û her wisa li pê berhevkirina zimanîn diyar dibe, ku gotina „qewal“ ji bêja zimanê Somerî „kalo“ tê. Ramana peyva „kalo“ bi wî zimanî tê mana mirovê dîndar, mirovê mezin û rûspî. Heya niha jî di zimanê me de bi taybetî li cem Ézîdiyên Şengalê gotina „kalo“ bi eynî ramanê tê bi kar anîn. Gotina „Şengal“ bi xwe jî ji peyva „kal“ pêk tê. Ew ji hevdûdana peyvîn „singî“ û „kal“ çêbûye. „Şengal“ tê mana mirovê dîndar yê mezin, micêwir û kahîn.(1)

Dîsan navê „Şingal“ê di Tewratê de bi navê „şinêar“ diyar dibe, ku „şinêar“ tê mana „deşta Babîlonya“ yanî „erdê Babîlonya“. Di hinek pirtûkîn dîrokî de dîsa tê nivîsin, ku perestgeheke mezin yê „Xûdawen“ (Xwedêyan) yanî

yê „Sin“ li çiyayê Şingalê hebûye. Ev jî îspat dike, ku reha peyva „qewal“ digihîje zimanê Somerî û Babilî û girêdaneyeke wê ya xurt bi van zimanîn ve heye.

Gotina „qewal“ ne tenê bi aliyê zimanî ve, her wisa ew bi aliyê tarix ve jî bi dîroka kevin ve girêdana xwe heye. Belkî qewalan anko „kalo“ di dema Babiliyan de xizmeta perestgehîn (ziyaretîn) dînî dikirin û li Def û Şibab di id û rojîn pîroz de didan. Yek ji wan idan(cejnan) ev e, ku ji wê re digotin „Îda birîna hiriya pez“. Di vê cejnê de rolêن qewalan roleke mezin bû û wan li Def û Şibab didan. Milet di vê cejnê de pez dianî û qewalan li müzikê anko li Def û Şibaban dixistin û xelkê hiriya pezên xwe dibirî. Ev roj iro dikeve meha nîsanê, pişticejna Sersalê, ku iro jî di enyî wextî de li gundê Behzanê „Îda Tewafa Xefurê Rêyan“ tê pîroz kirin û di vê cejnê de qewal vê bîranînê nûjen û pîroz dikin.

Qewal ji kîjan ber û eşîretê ne?

Hê jî tê gotin, ku tim û tim feqîr û qewal bi navê Şêx-Adî tê naskirin û ji wan re dibêjin „Feqîre Şîxadî“, „Qewalê Şîxadî“.

Ji koka xwe ve qewal bi tenê ji Eşîretê Hekarî û Dimilan bûn. Qewaltî jî ne bi helbijartînê ye, ev kar ji bav derbasî kûran dibe û çenâbe, ku kes ji der ve bê û bibe qewal. Lî wekî min bîhûstiye û wekî Qewal Sivo, lawê Qewal Silêman, ji min re digot: „Pişti fermaña Mîrê Kor, Mîr Mihemedê

Rewanduzî, di sala 1834 de qewal kêm bûn. Yekî ku navê wî Baso bû û ku ji Eşîreta Mamûsiyan bû, bi qewalan re diçe seferan. Ew mirovekî jîr bû û ilmê Şîxadî û Ézidîtiyê hilgirtibû û şûnde binemala wan jî bûne qewal“.

Qewal ji berê ve di du gundêن Ézîdiyan de rûdinin: Başik û Behzanê. Qewalên di van her du gundan de rûdinin, Qewalên dimili û hekarî ne. Qewalên dimili li gundê Behzanê û Qewalên hekarî li gundên Başikê dimîn. Eşîreta Dimilian ji bab û babkalkîkên xwe ve mirîdîn Şemsaniyê (mirîdîn Nasirdîn) ne. Eşîreta Hekariyan ji koka xwe ve mirîdîn Adaniyê (mirîdîn Şêx-Sin) ne. Heke qewal niha teví eşîretên xwe di nava van her du gundan de hatîbin parve kirin, dîsa jî wê demê qewal bi Tawisê re diçûn û her yekî ji wan ciyê xwe yê arînî li gel Tawisê hebû û heye. Qewalên hekarî li milê Tawisê yê rastê rûdinin, Qewalên dimili li milê Tawisê yê cepê rûdinin. Lewra jî dibêjin, ku Qewalên Dimili, mirîdîn Nasirdîn, nûnerên Şemsaniyê, li milê cepê Tawisê dîkin û Qewalên Hekarî jî, mirîdîn Şêx-Sin, nûnerên Adaniyê, li milê rastê Tawisê dîkin. Wekî me got, ku qewalên li Şibabê dixin hekarî ne û yên defê dixin dimili ne. Mana vê jî ev e: Pewist e, ku qewalên li Şibabê dixin ji diduyan kêmîtir nebin û li milê Tawisê yê rastê rûnin û qewalên defê dixin ji sisîyan kêmîtir nebin û li milê Tawisê yê cepê bin. Ji bo vê yekê ye, ku coqa Tawisê ji pênc qewalan kêmîtir nabe. Mezinê qewalan jî heye û ew ji Eşîreta Dimilian e, bi rîka meclisa rûhaniya Ézîdiyan ya bilind û mezinên Ézîdiyan tê nîşan kirin. Niha mezinê qewalan Qewal Silêman e kurê Qewal Sivo ye, ew li Behzanê dimîne û emrê wî zêdeyî 70 salî ye.

Çawa qewal fêrî ilm û mûzika dînî dîbin?

Berî 70-80 salî mekteba (dibistana) dînî li gundê Behzanê hebû. Ew mekteba fêrbûn û pêgihan-dina qewalan bû. Zarokên qewalan ji emrê 7-10 saliyê diçûn wê mektebê û fêrî qewl, beyt, diwa, lêdana Def û Şibaban ûhwd. dibûn. Baştirin û jîrtirin qewal li wê mektebê dihatin kivş kirin, qewalan ders didan zarakan, da ku ew di paşerojê de bibin qewal. Dibêjin ku Qewal Mam Îso mirovekî kor bû, lêbelê heta bêjî ew jîr û pahlewan bû û ew mamostayê dawî yê mekteba Qewalan bû. Wî, rehma Xwedê lêbe, komeke baş û navdar ya qewalan pêgihandibû, wekî Qewal Ilyas, Qewal Qewal ûhwd. Lê ci heyf pîstî mirina Mam Îso Mala Mîra ev mekteba dînî li Behzanê ji ber gelek sebeban girtin. Ev çiraya zanîn û marifetê hate vemirandin, divê iro hemî Êzîdî bi dengekî bilind bixwazin û bibêjin: Bila Mekteba qewalan ya li Behzanê bê vekirin! (**)

Jî bo yek blbe qewal, divê ci fêr blbe?

Kesekî bixwaze bibe qewal, sê merc (sert) ji wî têñ xwastin:

1. Divê ew mirovekî bi dev û ziman be, bi axiftina xwe ewanbe û di ilmê xwedayî de melevan be.
2. Divê dengê wî xweş be.
3. Divê zanîbe li Def û Şibaban bixe.

Berî her tiştî divê xwendevan (şagirt) fêrî lêdana Def û Şibaban bibe, ji bo vê yekê jî qewalê herî zirek û şareza ew e, ku yê bi awaz, kûbîfî û melodîya qewlan zanîbe. Ew dibe mamosteyê xwendekaran û nûfîr dersên mûzikîkê, lêdana Def û Şibaban li ber destê wî fêrdibin.

Tiştê zor fêrbûna melodî û kûbriya qewlan e. Her qewlek, qe-sîdekkê û beytek melodiyeke xwe û arinzi heye; belki 3-4 kûbriyan hene, anko bilindî û nizmiya gotinê wan qewl û quesidän bi deng. Ji ber wê yekê yên nû destpêdikirî re dibêjin: a. şagirt anjî nufîr(mûbtede) û b. ji yên baş dizanin re serhosta.

Piştî qewalîn nûfîr lêexistina Def û Şibaban serrasi dîkin û fêr dîbin, mamoste her roj 3-4-5 sebeqa ji qewl, queside, beyt ûhwd. dide ber wan. Qewalîn nufîr roja din tiştîn fêrbûyî ji bo mamosteyê xwe dûbare dîkin. Heke wan tiştê mamoste dide ber wan, baş ezber kiribin, mamoste hingê çend sebeqên din dide ber wan û ew bi vî awayî Qewlan jiber dîkin. Şûnde mamoste qewlekî nû dide ber qewalîn nûfîr (şagirt).

Ilmê dînê Êzîdîyan pir zor e. Lewra em binêrin, ka programê mamoste bi ci dest pê dike? Helbet her qewalek gerek e, ku di destpêkê de van tiştan hûn bibe:

1. Diwayan
2. Qewlê Terqîn û Nasîn, Qewlê Seremergê, qewl û diwayêni li ser miriyan têne gotin.
3. Beyta Cindî, Beyta Sibê, Beyta varê
4. Her heft quesidîn li gel her heft semaya têne gotin, jiber ku beyt û quesidîn her heft semayan her roj têne gotin.
5. Piştî qewal fêrî qewl, queside, beyt, diwayan dîbin, dest bi fêrbûna kûbriya wan dikin, jiber ku ew qewalî nufîr hêdî hêdî van qewlan bi deng bi qewalîn şareza re dibêjin û diniklinin.
6. Heke qewalîn nûfîr hemî xalîn jorîn (1-5) bi serfirazî standin, mamosteyê wî wî fêrî Mishabeta dike.

Mishabet di xwendina qewalan de dereca bilindirin ya fêrbûniyê ye, jiber ku mishabet zîrekî û şarezetiya qewal derdixe medanê. Ew çawa dikare felsefa dînê Êzîdîyan şirove bike, şirestan li wan bike û şireata wan bibire ûhwd.

Ji bo fêrkirina Mishabeta rîyeke qewalan ya taybetî heye. Hinga mishabet tê gotin, qewalî nûfîr li tîra qewalan rûdinê û guhê xwe dide corê gotinê mishabeta wan.

Sistem û derecên qewalan

Sistema qewalan ji çar dereca pêkhatiye:

1. Mezinê Qewalan
2. Begê Sinceqê (Sinceq Begî)
3. Serhosta
4. Nûfîr (şagirt)

Mezinê Qewalan

Ew serok û rîberê qewalan e: Ji aliyê hilbijartin û hînkirina wan ve, ji aliyê birêvebirina karê wan ve, her wisa ji bo destnîsankirina coqa qewalan li gel Tawisê ji bo Çiyayê Şingalê, Welatê Şêx, berê ji bo Tirkîyê (Welatê Xalta, Wêhranşar, nav Çêlkiyan), Sûriyê, Rûsiya (Tawisa Moskofê), Iranê (Tawisa Tewrêzê) û hwd.

Mezinê Qewalan endamê serkatiya meclîsa rohaniya Êzîdîyan ya bilind e. Ew li gel gera Tawisê diçe gundê Êzîdîyan û Lalisê û karê Tawisê û qewalan bi rê ve dike.

Wekî me di dest pêkê de jî got, mezinê qewalan ji Eşîreta Dimiliya ye û rûniştvanê gûndê Behzanê ye.

Begê Sinceqê

Ew dereca her bilind ya qewaltîyê ye, ew seyda ye û dema li dîwana Tawisê amade be, ew mishabetê dibêje.



Qewal li Cemaiya Şîxadî li Def û Şibabê dixin

Wêne: Dr. Şêx Xelîl Cindi

Begê Sinceqê divê ji qewalên hekarî anjî ji qewalên dimili be. Timî divê ew li gel Tawisê be û li teniştâ Tawisê ya rastê û çepê rûnê, jiber ku Begê Sinceqê temsila Şêx-Sin û Şêx-Şems dike. Di vê derheqê de yanî li ber Tawisê kesekî ji Begê Sinceqê mezintir tûne: Ne Mîrê Şêxa, ne Babê Şêx, ne jî Pêşîmam. Kijan ji van kesan bêñ dîwana Tawsê jî, Begê Sinceqê ne meçbur e, ji pêş wan ve rabe, ciyê xwe bide wan. Her çiqas şiret û çareser-kirina probleman hebe, Begê Sinceqê dibire, jiber ku ew bi navê Şîxadî, Şêx-Sin û Şêx-Şems diaxive, jiber vê yekê jî tim Begê

Sinceqê qewalên bi emîrê xwe mezin in, rûhspî û bi tecrûbe ne.

Serhosta

Ew qewal e, yê ku melodî, kûbrî, awazên hemî qewlî, quesîde, beytan hildigire, dizane û bi gera Tawisê re diçe. Serhosta serokê coqa qewalan e, wekî serokê orkestrayê. Ew hem li defê dixe û pêre qewlan dibêje û hem jî çavê xwe dide qewalên din yên li Def û Şibaban dixin, da ku ew ne kevin tû şâsiyê û kûbriyê winda nekin. Tiştê balkêş jî ev c, ku qewalên li Şibabê dixin, li milê Tawisê yê rastê rûdinin û ew temsila Şêx-Sin dikan.

Qewalên defê dixin li milê Tawisê yê çepê rûdinin û ew temsila Şêx-Şems dikan. Li virê qewalên nûfîr jî li gel qewalan rûdinin, lê ew hemî qewlî û qesîda bi rêt nakin, belkî bi tenê sebeqa dawiyê bi qewalan re dibêjin.

Nûfîr (mûbtede)

Ew ev kes e, yê ku hê nû dest pê dike here dersên dînî û fêrî karê qewaltiyê dibe.

Cûreyên semayan

Di nav edebê dînê Êzîdiyan de heft cûreyên semayê hene. Şert e, ku qewal bi gotin û kûbrî her heftan jî bizanîbe. Navê wan ev in:

1. Semaya Mezin anjî Semaya Qanûnî. Qewlê „Maka Êzî“ li gel vê semayê tê gotin.
2. Semaya Zerza(***) anjî Gavanê Zerza. Pirtirîn eşîreta dimiliya vê Semayê daxwaz dikan.
3. Semaya Bilind
4. Semaya Şêx-Şems
5. Semaya Şerfedîn
6. Semaya Maka Êzî
7. Semaya Merkeba

Ev sema li gel Tawisê li gundan nayê gotin, belkî ew li ser miriya, li goristanan tê gotin û jîn sê caran li dora tîrbê (gore) digerin. Em dikarin bibêjin, ku Semaya Merkeba semaya mirinê ye.

Kar û wezîfên qewalan

Bi rastî dema ku mirov bixwaze karêñ qewal pê radibin, rîzbike, divê hingê mirov xizmeta wan ï dînî ya bi cî fînin, bide ber çavan. Hingê mirov dizane, ku dewrê qewalan çiqas mezin û pîroz e û qedrê wan çiqas giranbuha ye. Mirov dikare bibêje, ku ew giyan û nefesê di ber bawerîyê oldarî de dikan. Bi saya wan rewş û berdewamî dayê giyana olî û

heta îro felsefa dînê Êzîdiyan karibûye bimîne û nemire. Ji bo vê yekê ez dixwazim her Êzîdiyekî dilsoz, xwudan bext, dengê xwe bilind bike û bibêje: Bila dibistanêñ qewalan bêne vekirin, bila em nehêlin destgeha qewalan zehif bibe, jiber ku koka dînê Êzîdiyan li ser aliyê hiş û hisî hatiye avakirin, ne wek li ser aliyê şirîet û kitêban(pirtûkan). Ji bo vê yekê mesela ruhî, mûzîk (Def û Şibab), gotina şîret û mishabetan roleke mezin di baweriya Êzîdiyan de dilîzin. Bi tenê eze çiroka dûristkirina Adem û çawa ruh nedihate berdan, bibêjim.

Ji ruh re gotine: „Ji bo çî tû nakevî ber giyanê Adem“

Ruh jî gotiye: „Ferman ji ba Xwendê ji min re nehatiye, heya saz û qidûm (Def û Şibab) ji asmanan neyêne xwar, ez nikarim bikevim qalibê Adem.“

Berî heftsed sal heft sûr hatine hindave.

Qalib mabûyî bêî gave gote rûh: „Ma tu ji bo çî naçî navê?“

Rûh got: „Li ba aşîqa we malûm e, heya bo min ji bana neynin „Saz û Qidumê“, nîveka ruh û qelibê Adem Pêxember zor tûxum e.“

„Saz û Qidum“ hatin û hidirî, nûra mûhbetê hingivte seri, ruh hat û qalibê Adem Pêxember êwîfî.

Binêr: Qewlê Zebûnî Meksur, Sebeqa: 32,33 û 34

Hinek ji kar û barê pîroz yêñ qewal pêradibin, ev in

Li Lalişê

Her cara cejnek, tor û tibetekî Êzîdiyan li Lalişê çêbibe, diyê wekî mercekî sereke qewal têda amade bin.

- Di berbanga sibehê de yanî berî ronahiya rojê derkeve, qewal

Beyta Cindî li gel Def û Şibaban dibêjin û hanê dîkin, ku Êzîdî ji xewê rabin û îbadeta xwe bikin û herin karêñ xwe.

- Serê sibehê bi derketina rojê re Beyta Sibê dibêjin. Ev Beyt li gel Mehter tê gotin. Mehter jî du heb cûr in: Mehtera Tewrêzî û Mehtera şamî. Awaz û kûbriya Mehteran wekî awaza marşen eskeriyê (leşkeriyê) ne. Demê bi dehol û zîrnê tê gotin, dibêjinê Meytinxane.
- Sibehê di dema simatê de qewalek amade dibe, bi tenê li Şibabê dixe û pêşewaziya simatê dike. Ew ji Şîlana Şîxadî tîne ber Celsa Şîxadî.

- Varê berî roj here ava ji bo rewankirina nûra Xwedê qewal Beyta varê dibêjin. Helbet dema qewal dibêjin, pêre li Def û Şibaban jî dixin. Carna ji xeynî vê beytê beytên din jî tê gotin, mesele wekî Beyta Beharê anji Beyta Esiya.

- Çaxê dibe şev û Êzîdî li hev komdibin, Qewalê Begê Sinceqê dest bi mishabetan dike û ku ew temam bû, simat tê pêşkêşkirin.

- Piştî mishabet xilas dîbin, Sema Celsa Şîxadî tê kirin. Ew jî bi amadebûna hemî mirovên dîndar û mezinêñ ocazan wekî Pêşîmam, Bavê Şêx, Şêxê Wezîr, Mîrhec, Micêwirê Şîxadî, Micêwirê Kaniya Spî, Koçek, Pîr, Şêx û hwî. Heft heb ji van kesan semayê digirin û sê caran li dora Çeqel tuyê (Çirayê) digerin.

- Qewal dibine du rêz û dest bi gotina qewlekî dîkin, her rêzek sebeqekî dibêje, rêza din sebeqa pêra li wan vedigerînin. Pirtîn di nav van şaxan de Qewlê Medîh û Stayîşa tê gotin, mîna Qewlê Şêx Hesen Sultan anji Qewlê Pîr Dawid anji Qewlê Bayzidê Bastamî.

- Di morkirina berê şibakê de disan qewal li Def û Şibaban dixin û qewlan dibêjin.

- Roja Qepaxê yanî dema golikeki ji ber Şîxadî dibene ber Şêx-Şems, qewal dikevin pêşiyê û li Def û Şibaban dixin.

- Perî-Guhastina ji ber Şêx-Şems û Kaniya Spî bo ber Şîxadî dîsan qewal pêra dîbin.

- Morkirin û ciwankirina Tawîsê di roja dawiya cilê havînê de qewal tê ser kaniya ku Şîxadî li ser rûdiniş, Tawîsê tînin û bi simaqê û ava kaniyê mor dîkin, şes-heft qewal li wê derê qewl û beytan dibêjin.

- Roja dawiya cejna Cemayıye li heft ciyêñ cuda sematêñ giran wekî li ber derê Kaniya Spî, li ber Şêx-Şems, li ber Mîr Êzdîn û li gelek ciyêñ din têñ kirin.

Gera Tawîsê

Bi kêmâsi salê du caran Tawis li nav gundêñ Êzîdiyan digere. Di vî demê de Beyta Sibê, Beyta varî, Mishabet, Sema têne gotin û kirin.

Lêxistina Def û Şibaban li ser mirîyan

Berê demê yek diket ber kîferta mirînê, du qewal dihatin ber serê wî Qewlê Seremergê digotin, heta wî mirovî ruh dispart. Lê niha Qewlê Seremergê li ser yê mirî dibêjin, gava ku wî gordikin, her wisa qewal pê ra li Def û Şibaban jî dixin. Hinga cenaze ji malê radikin û dîbin ser goristanê, bêgûman qewal awazê şînê yanî xemgîniyê lêdixin.

Her li gel cenaze qewal jinek bi xwe re hildigire û jin li pêşîya wî diçê, qewalek jî li Şibabê dixe û li pey cinaze diçê û li pey wî jî du qewalêñ li Def di dest de têñ. B vî awayî heta digehîjin ser goristanê.

Qewal heft rojan li mala yê mirî dimînîn, taziya wî dîkin, roja sêyemîn ji yê mirî re semayê li dar dixin.

Sinet kirin

Berê û niha jî li hinek ciya dema zarokan sinet dikirin, qewala bi awazekî arinzî li Def û Şibaban dixistin. Bi vê yekê jî diyar dibe, kû sinet bi rewişike pîroz tê hijmartin.

Rojên cejn û tiwafa

Di van idan de sematên giran têñ girtin û qewal qewalan dibêjin, li Def û Şibaban dixin. Ev Cejn û Tiwaf ev in: Cejna Sersalê, Cejna Ezî, Cejna Çilê Zivistanê li Lalishê, Cejna şevberatê li Lalishê, Cejna Çilê Havînê li Lalishê.

Tiwafa Sema bi şev li cem Xasa (Xûdanêñ Gundan) têñ girtin û berî hingê Beyta Sibê û varî tê gotin.

Govend

Govendêñ li ber derê Kaniya Spî, Suka Marifetê, govendêñ li gûndan yên dema gera Tewisê. Ev govend hemî bi Def û şebabûn têñ gerandin.

Têbini

Ev babet min wekî ders du rojan li Universita Georg-August li Gottingen ji bo Prof. Dr. Philip Kreyenbroek û Dr. Ludwik Paul pêşkêş kir.

Dîsan ji bo vê babetê min gelek zaniyarîyê hêja ji Qewal Sivo yê kûrê Qewal Silêman standin. Ez gelek spasiya wî dikim ji bo van zaniyarî û arikariya ciwamêr. Ez hêvidar im, ku li ser vê babetê bêtir vekolîn çêbibin û heqê wê li gorî dewra wî yê mezin bê dayîn.

1. Binêre: Dr. Xelîl Cîndî: Ber bi zanîna rastiya dînê Ezidiyan, Xeleka:2, Sala:1993, R:38, bi Erebî

(**) Em daxwaz dikin, ku dibistanêñ(mektebêñ) dînî(olî) ji bo qewalan wek dema berê li Behzanê û yeke din li Lalishê anjî li ciyekî din bêñ vekirin û ev ji xêr û xeratêñ Ezidiyan, ji ya Lalişa Tawisê, ji ya Kaniya Spî, ji ya Şêx-Şems bêñ finanse kirin û ew ji bo mektebêñ dînî bêñ xerc

kirin. Careke din divê em çavêñ xwe bidin qewalan û beşeke baş ji perê me gotî wekî xerciya heyvane ji bo qewalan bê diyar kirin. Da ku careke din cirayê nîvvemirî şewq û ronahî bidin!

(***)Sema Zerza: Ev Semaye behra pirtirîn bi Eşfreta Dimiliyan ve girêdayî ye. Wisa tê gotin, kû nexweşî dikeve nava vê eşiretê û Meme Reşan (Pîr û Xasêñ Ezidiyan yên navdar û ciyê baweriya Şîxadî bû) di wê demê de nexweş ketiye. Hinek ji Dimiliyan mechûr bûn, ku ciyayê Meqlubî, yê ku ciyê mîrgeha wan li wîr bû, terk bikin û herin Tirkiyê û misilman bibin.

Elewiyêñ niha li Tirkiyê nê û zimanê wan re dibêjin "Zazakî" anjî „Dimîlî“ perçek (beşek) ji wan in. Beşê din jî koçberî Kürdistana Iranê bûn, ew jî bisilman bûn. Tenê Dimiliyêñ Welatê Şêx Ezidî man. Semaya Zerza jî bi wê dîroka nexweş ve girêdayî ye.

Die Qewals - Das Gedächtnis des Yezidentums

Dr. Khalil J. Rashow

Aufgaben und Funktion der Qewals

Die Aufgabe der Qewals besteht darin, die Qewals (religiösen Gedichte, Erzählungen und Lobsymnmen) und die Di'a (Gebete) auswendig zu lernen und an die Yeziden weiterzugeben. Bedenkt man, daß die Vermittlung des Yezidentums weitestgehend mündlich erfolgt, so kann man die Qewals als religiöses Gedächtnis der Yeziden bezeichnen. Mit ihren Vorträgen in Lalish, dem Religionszentrum der Yeziden, und auf ihren Reisen zu yezidi-

schen Siedlungen, erinnern sie die Yeziden an ihre religiöse Identität und Verpflichtungen. Da sie die Träger der heiligen yezidischen Texte sind, genießen sie bei den Yeziden einen hohen Respekt. Selbst größere Streitigkeiten können die Qewals meistens erfolgreich schlichten. Damit übernehmen sie neben ihrer religiösen Funktion, nämlich die religiösen Lehren zu bewahren und zu vermitteln, eine sehr wichtige soziale Funktion.

Die Qewals sind für Yeziden, deren Siedlungsgebiete weit entfernt vom religiösen Zentrum lie-

gen, wie die Yeziden aus Syrien und früher auch aus der Türkei, eine wichtige Schnittstelle und Informationsquelle ihrer Religion. Bei ihren Besuchen nehmen die Qewals freiwillige Abgaben entgegen, die für die heiligen Stätten und das weltliche Oberhaupt (Mir) bestimmt sind. Die Qewals werden ebenfalls anteilig bedacht.

Die Herkunft des Wortes Qewal

Während bis vor kurzer Zeit noch angenommen wurde, daß

das Wort Qewal aus dem Arabischen von qale-qewl (Person, die etwas erzählt) abstammt, zeigen einige neue wissenschaftliche Erkenntnisse und Sprachvergleiche auf, daß die Abstammung im sumerischen Wort Kalo zu identifizieren ist. Im Sumerischen bezeichnet Kalo einen Religiösen mit weisem Charakter. Unterstützt wird diese These durch die Tatsache, daß die Yeziden aus dem Sinjar-Gebiet (Shengal, Nord-Irak) noch heute das Wort Kalo als Synonym für das Wort Qewal verwenden.

Der Ursprung der Qewals

Der Ursprung der Qewals geht auf den yezidischen Reformator Sheikh-Adi (1074-1162) zurück. Deshalb bezeichnet man die Qewals auch häufig als Qewals von Sheikh-Adi. Das gleiche trifft im übrigen auch für die Fakire (yezidische Geistliche, die den weltlichen Dingen abgesagt haben) zu.

Ursprünglich stammen die Qewals nur vom Stamm der Hekari und Dimili ab. Die Zugehörigkeit zu der Gruppe der Qewals kann nicht erworben werden, sondern ist exklusiv, d.h. aufgrund der Abstammung von Qewal-Eltern. Nach meinen Forschungen, die sich auch mit den Informationen von Qewal Sivo, dem Sohn des jetzigen Oberhauptes der Gruppe der Qewals, decken, wurde in der Geschichte der Yeziden einmal von dieser Regel abgewichen. Im Jahre 1834, der Zeit der Yeziden-Pogrome des moslemischen Kurdenführer Mir Mihemedê Rewanduzî, auch Mirê Kor genannt, gegen die Yeziden wurde die Zahl der Qewals erheblich reduziert. Aus diesem Grunde wurde ein yezidischer Gelehrter namens

Baso vom Stamm der Mamûsî zum Qewal ernannt. Die Übertragung der Qewal-Würde erstreckte sich auch auf seine Familienmitglieder.

Die Qewals besiedelten ursprünglich zwei Dörfer im Nord-Irak: Die Qewals vom Stamm der Dimili bewohnten das Dorf Bahzani, die Qewals vom Stamm der Hekari bewohnten das Dorf Bashik.

Hinzu kommt der Unterschied, daß die Dimili-Qewals als Schutzpatron (Khudan) Nasirdin (Nasir-din), die Hekari-Qewals Sheikh-Sin (Şêxîn) haben.

Die religiöse Unterweisung der Qewals

Vor ca. 70 - 80 Jahren gab es im Dorf Bahzani eine Religionsschule für Qewals. Hier wurden die Kinder der Qewals in den Qewls, den Gebeten (Beyt und Di'a) und dem Gebrauch der Musikinstrumente Def (große Tamburin) und Shibab (Flötenart) unterwiesen. Nach dem Tod des großen Qewal-Gelehrten Iso wurde die Schule auf Anweisung des damaligen Mir (Bezeichnung für das weltliche Oberhaupt der Yeziden) geschlossen.

Die religiöse Unterweisung erfolgt nunmehr auf regelmäßigen Sitzungen, bei denen die älteren und ausgebildeten Qewals die jungen Qewals unterrichten.

Voraussetzungen für die Ausübung des Qewal-Amtes

Nicht jeder Yezide aus der Gruppe der Qewals ist automatisch berechtigt das Qewal-Amt auszuüben.

Für das Erlangen dieser besonderen Würde muß er mindestens

die drei folgenden Bedingungen erfüllen:

1. Umfassende Kenntnisse der yezidischen Lehre und der heiligen Texte
2. Redegewandtheit und eine klangvolle Stimme
3. Uneingeschränkte Beherrschung der Musikinstrumente Def und Shibab

Besonders schwierig ist das Erlernen der Begleitmelodien der Qewls, da jedes Qewl eine spezielle Melodie erfordert.

Nachdem ein Schüler die Musik beherrscht, wird er an die religiösen Texte herangeführt. Als ausgebildeter Qewal muß er die wichtigsten religiösen Erzählungen und Gedichte auswendig rezitieren können.

Da die heiligen Texte der Yeziden sehr umfangreich sind, werden die religiösen Inhalte in nachstehender Reihenfolge gelehrt:

1. Di'a (Gebete)
2. Heilige Erzählungen und Gebete, die sich mit dem Tod auseinandersetzen.
3. Die nachfolgenden Beyts (Text in Gedichtform, der sich mit den Pflichten und der Verantwortung der Gemeinschaft beschäftigt), Beyta Cindi (Lied über den Barmherzigen), Beyta Sibê (Morgen-), Beyta Evarê (Abendgebet)
4. Sieben religiöse Texte für die in Lalish abgehaltene Zeremonie Sema (eine Art religiöses Theaterstück, das sich mit dem Gebet und der Verehrung der sieben Engel für Gott beschäftigt und von den religiösen Instrumenten Def (große Tamburine) und Shibab (eine Flötenart) begleitet wird)
5. Die Melodie der hl. Texte
6. Wenn der Schüler die Punkte

1-5 beherrscht, wird er in Mishabet geschult.

Bei der Mishabet lernt der Qewal mit dem bewußten Vortragen von Auszügen einer religiösen Erzählung und deren Interpretation Antworten auf gesellschaftliche Probleme zu geben. Mishabet ist die Vollendung der Qewal-Kunst.

Hierarchie der Qewals

Oberhaupt der Qewals Mezinê Qewalan

Er ist der uneingeschränkte Führer und Wegweiser der Qewals und verantwortlich für die religiöse Erziehung und Koordination der Qewals. Er ist zugleich Mitglied des Religiösen Rates. Das Oberhaupt der Qewals muß vom Stamm der Dimîlî sein und residiert im Dorf Bahzani.

Begê Sinceqan Verwalter der Sinjeq

Qewals, die über herausragende Kenntnisse der heiligen Texte verfügen, wird der Titel Bege Sinceqe (Verwalter der heiligen Ta'us-Symbole) verliehen. Dieser Titel ist nach dem Amt des Oberhauptes die höchste Auszeichnung, die ein Qewal erreichen kann.

Als Seyda (Religionslehrer) unterrichtet er die Qewals. Er kann sowohl vom Stamm der Hekari als auch der Dimîlî sein. Seine wichtigste Aufgabe ist, bei den Ta'us-Wanderungen dabei zu sein. Er vertritt die Schutzpatrone Sheikh-Sin (Şêxîsn) und Sheikh-Shims (Şêsimş). Bei den Ta'us-Wanderungen nimmt er die höchste Stellung ein.

Selbst der Mir als weltliches und der Baba Sheikh als religiöses Oberhaupt sind bei diesem Ritual dem Begê Sinceqan untergeordnet.

Serhosta

Bei den Ta'us-Wanderungen rezitiert er die Qewls und spielt dazu Tamburin und achtet darauf, daß die übrigen Qewals die Musik richtig spielen.

Nöter

Hiermit bezeichnet man einen in Ausbildung befindlichen Qewal.

Religiöse Handlungen der Qewals

In Lalish

Bei allen Feierlichkeiten und religiösen Anlässen in Lalish sind Qewals anwesend und nehmen eine wichtige Funktion ein. Dabei verfahren die Qewals wie folgt:

Vor Sonnenaufgang wird das religiöse Lied Beyta Jindi (Beyta Cindi) in Begleitung des Def und Shibab gespielt. Sie fordern die Yeziden auf aufzuwachen und rufen zum Gebet auf.

Mit Sonnenaufgang singen die Qewals das morgendliche Beyt (Di'a Sibê). Anschließend wird ein religiöser Marsch gespielt.

Bevor das Simat (religiöses Essen aus Getreide), das in der Küche Sheikh-Adi's gefertigt wurde, im Hofe Sheikh-Adis gegessen wird, spielt ein Qewal mit der Shibab eine kurze Melodie.

Vor Sonnenuntergang wird das abendliche Gebet (Beyta Évarê) verrichtet. Es kommt auch vor, daß andere heilige Texte gesungen werden.

Am Abend, wenn die Yeziden sich sammeln, beginnt der Begê Sinceqan mit dem Mishabet.

Nach dem Mishabet wird das religiöse Theaterstück Sema mit der musikalischen Begleitung der Qewals aufgeführt. Bei dieser religiösen Zeremonie sind die bedeutendsten religiösen Würden-

trägern anwesend, wie der Baba Sheikh und der Peshimam. Sieben dieser Würdenträger spielen die Rolle der Engel, die zu Ehren Gottes drei Runden um ein Feuer kreisen. Anschließend wird wieder Simat gereicht. Die bei dieser Aufführung vorkommenden sieben Engel werden von den Würdenträgern gespielt.

Ta'us-Wanderungen

Jährlich bereisen die Qewals die yezidischen Dörfer. Auf Ihrer Reise nehmen sie eine Bronzestatue (Sinjak) mit, die Ta'usi-Melek symbolisiert. Die Statue wird in einem Zimmer aufgestellt. Die Qewals tragen religiöse Texte vor. Die Yeziden küssen die Statue. Die Qewals verteilen Berat (runde weiße Kugel, die aus der heiligen Erde von Lalish geformt wurde) und geben den Yeziden einen Schluck vom Wasser von der heiligen Weißen Quelle (Kaniya Sipi) aus Lalish. Nach Abschluß dieses Rituals zahlen die Yeziden freiwillige Abgaben an die Qewals.

Sterbefeierlichkeiten

Zu den Sterbefeierlichkeiten singen die Qewals das religiöses Lied Qewlê Seremergê, das sich mit dem Leben, dem Tod und dem Leben nach dem Tod befaßt.

Religiöse Tänze

Zu den speziellen religiösen Tänzen vor der Weißen Quelle in Lalish, auf der Brücke der Güte (Pira Marifetê), den Jumaiya-Feierlichkeiten zu Ehren Sheikh-Adi's (Kabax) und bei den Ta'us-Wanderungen spielen sie Def und Shibab.

Übersetzung aus dem Kurdischen von T. Tolan und C. Issa.

Die Beziehungen des Sufismus zum Yezidentum

Eine religions-wissenschaftliche Betrachtung von Dr. Pir Mamou Othman

"Die Schöpfungsgeschichte und die Rolle des Bösen im Koran hatte mich inspiriert, ich wollte sie immer wieder lesen, insofern sie meiner Lage, meinen Zielen und Interessen entsprach." (1)

Von alters her richteten sich die Blicke auf die orientalischen Länder und die Völker, die schon lange vor anderen die Strahlen der Sonne verehrten, der göttlichen Sonne, welche verbunden ist mit der höchsten Form an Reinheit und einer vollendeten Qualität. Auch die Länder, denen prophezeit war, daß sie in ihren Tempeln und durch die Arten ihrer Anbetung Geheimnisse bewahren werden, die zur Schöpfung der Religionen inspirierten.

Diese alten Religionen beruhten im Unterschied zu den himmlischen Religionen auf der direkten Beziehung zwischen Mensch und Gott.

Die alten Religionen bauten auf dieser direkten Verbindung zwischen der göttlichen Welt und der menschlich-natürlichen Welt auf. Sie beruhten demzufolge auf einer Brücke zwischen den Menschen und ihren Göttern. Die himmlischen Religionen wie das Judentum, das Christentum und der Islam, basierten auf dem Gegenteil. Sie haben die direkte Brücke zwischen Gott und Mensch aufgehoben mit Ausnahme der Brücke der Prophetenschaft und der Offenbarung. Demzufolge legen sie eine vollständige Trennung der göttlichen und der menschlichen Welt fest.

Guhdariya Şêx, Pîr û Feqîrên baş
û di rêya Tawisî-Melek de bikin.
Ew Dunavê ne di rê de be û
tiştên çewt û pûç bike, ne bi
gotina wî û ne jî guhdariya wî
bikin.

5. Zarokêñ xwe fêrî rê û rismêñ
Êzidîtiyê bikin, fêrî zimanê Kurdi

bikin. Di malên Îzîdiyan de ew dikarin van tiştan hînbibin. Bi zarokêن xwe re bi zimanê kurdî biaxîvin û bipeyvin, ew zimanê daykêن me, zimanê qewl û diwayêن me û bingeha ola me ye.

6. Em ne dijî tu rêxistin û partîyan in. Kî piştgiriya me bike, em spasî wî dîkin û jê re diwaçî ne. Lê heke rêxistînekê li dijî me raweste û hewl bide xwe, ku kar û barê me tîvîhev bike û li hev bixîne, em jî li dijî wê ne. Em Êzîdî xirabiya tu kesî naxwazin, bitenê ji me tê, divê em xwe ji xirabiyê dûr bikin - Xêra bide û seran wergerîne.

Em li pey navê Tawîsî-Melekê xwe yê şêrîn in, ji vê rêya pak tucar dernekevin. Heke yekî ji we re got, ku bav û kalên wî Êzidî bûn, kêfa xwe jê re bîrnîn û jê re bibêjin, ku her yek ji me ser dînê xwe, lê dîsa em birayêñ hev in. Em dê rûmetê bidin her kesêñ qenc. Bila ew dost û hevalêñ me bin".

Mîr Tahsin Beg gotina xwe wîsa berdewam dikir: "Scrê her tişti tifaq e, palên tifaqê bin, Êzidîtiya xwe biparêzin, hûn hevalbendên ci partiyê dibin û kar û bar bi ci partîyan re bikin, hûn serfiraz û hur in, lê belê Êzidîtiya xwe ji bir nekin!".

Mîr Tahsîn Beg: Nîvê xêr û xêratên Êzîdiyan ji bo avayêن Lalişê û xizmeta Êzîdiyatîyê ne

Namake Mîr Tahsin Beg, serokê ola Êzîdxanê gîhişte kovara me. Mîr Tahsin Beg di vê nama xwe de mîzgîniyêن xérê ji Êzîdiyan re şandin. Wî biryar standiye, ku Qewl û Duwayên ola Êzîdiyan ku heta niha qederekî baş jê hatiye topkirin berhev bike û bêñ çapkirin. Ji bo vê yekê jî komîtake kar hatiye avakirin. Ev komîte dê li avayêن Lalişa Nûranî çavdêr be, ku derêن hewceyî tamîrê bin, di zemanê xwe de bêñ tamîr kirin. Bi dîtina me biryara her gerîngtir jî ev e, ku dibistana ola Êzîdîtiyê ji nûv ve bê vekirin. Nîvê xêra Êzîdiyan ya dikeve destê Mîr Tahsin Beg, bide vê komîta kar. Em hêvidar in, ku ev karê pîroz ji alyê hem Êzîdiyan ve piştgirtî bibîne. Bi vê bîr û baweriyyê em dixwazin nama Mîr Tahsin Begê ola Êzîdxanê, bêñ ku kurt bikin, pêşkêşî we xwendevanêن xwe bikin.

Rêdaksiyona Dengê Ezidiyan

© 2014 Microsoft Corporation

Pistík vezetékben fűződik minél gyorsabban, minél közelebb hozzájárulhat a beüzemeléshez. Bodzánkra törölhető, illetve rövidítendő, de nem lehetséges levezetésünkön kívül valamit szabadon is. Ez kiemelkedően jó példája az eladásnak.

Het aantal prijsvraaglijsten dat de dag daarop bij de postkantoor werd ingezonden, was niet veel meer dan de helft van dat van de voorafgaande week. De laatste week was er een grote daling te zien. De laatste week was er een grote daling te zien. De laatste week was er een grote daling te zien.

Wetenschappelijke en praktische toepassingen van de psychologische wetenschappen

Excellence in Research and Practice

Agadun: Dİ domake nözük de, dı de kasa evi yolu ya ve, nıza ji we ne biréhikun.

Mir Tahsin Seid Beg

Serokê civata birêvebira gîstî ya ola Ezidîtiyê li cîhanê

Serinc û daxwazî

Xuya û diyar û eşkere ye, ku civata me ya rûhanî heye û Bavê Şêx serokatiya olî dike û her wiha rê û rismên me yên pîroz û kevnar hene. Wekî din jî Lalişa me ya Nûranî ronahiyê dide cihanê. Ew cî û warê me û rismên me ye. Me Tawisa Şîxadiyê karî xêr heye, ew jî Qewalê me yên bi rûmet li nav gel digerînin. Mebest jî vî karî jî ew e, ku Êzîdî her û tim girêdayê ola xwe bimînin û xizmeta kelepûrên me bikin. Êzîdî bi eşq û dilekî tije



Feqîr Hecî metbexçîyê Mala Şîxadî

xêr û xweşî qesta Lalişa Nûranî dîkin û bi vê yekê jî rê û rismên Êzîdiyan bi cî tînin. Dema Qewal Tawisa Şîxadî gund bi gund, herêm bi herêm û welat bi welat digerînin, Êzîdî lê tiwaf dibin û xêra xwe ji bo navê Xwedê, Tawisî-Melek û Şîxadî didin. Berî niha, wekî em ji bav û kalan dizanîn, ev xêra han ji bo avakirin û nûkirina Lalişa Nûranî û kar û barêni xizmeta Mala Şîxadî bû, ji bo avakirina derên hêriyî û wan qub û hilîlêna xasên me bû. Lê belê wisa diyar e, ku ev xêra Êzîdiyan ne bi temamî didane destêni Mîrê Şêxan û Civata Rûhanî.

Êdî wisa lê hat, ku Mîrê Şêxan

deriyê Lalişê û Tawisa Şîxadî dîda demankirin û sal bi sal piraniya vê xêrê jê re dima. Jiber vê sedemê jî wî herdu kaniyên xêrê dixist destêni wî mirovê, ku bêtir didayê. Bi vî karê paşverû û nedirist Lalişa me bê guhdan dima. Wan giştan guhdana olî pişt guhêñ xwe re avêtin. Êdî ev kar bûbû weke karêñ bazirganiyê - dûr jî navê Xwedê, Tawisî-Melek û Şîxadî. Em gişt vî karî ne dirist dibînin û weke kêmasiyeke mezin ji Êzîdîtiyê û Mîrê Şêxan re dibînin. Di vê derheqê de em milê xwe didin milêñ wan xort û keçen Êzîdiyan li welêt, yên dengê xwe bilind dîkin û dibêjin, ku xêr û xératêni Mala Şîxadiyê

karî xêr û Tawisa wî ya pîroz pêwest e bikivin bin xizmeta vê Mala pîroz û ji bo avakirina Lalişa Nûranî be. Daxwaziya me ew e, ku ev xêr ji niha û pê ve bikive destêni komîteke hilbijartû. Komîta gel jî karê wê dê ew be, ku hindek ji van peran bide Mîrê Şêxan, parekê jî bide Qewal û xizmetkarêni Mala Şîxadî û bi para din jî Mala me ya pîroz nû bike. Em dixwazin, ku ew mirovêni serderiya Mala Şîxadî dîkin li gor navê xwe bin û hêja bin. Bila em û ola me nebin benîşte devê mirovê xêrnxwaz. Bihêlin em weke cilêni xwe rûber sipî bin. Lalişa Nûranî bi rûmet e û pêwest e em wê bi rûmet bihêlin.

Bîranînek li ser jiyana Mîr Xêrî Beg

Mîr Xêrî Beg, kurê Se'îd Beg, kurê Alî Beg, di sala 1930î de li Ba'edra Mîran - Mirgeha Şêxan - hatiye cihanê û ronahiya vê dinya gewrik dîtiye. Di sala 1944an de, pişti mirina Mîr Se'îd Beg, gelê Êzîdî û civata wan ya rûhanî Tehsîn Beg, birayê Xêrî Beg hilbijartin û wî danîbûn şûna bavê wî. Mîr Xêrî Beg şêwirdarê birayê xwe bû û milê wî yê rastê bû. Heke Mîr Tehsîn Beg ji bo pêkanîna kar û barêni Êzîdiyan ji Mirgehê dûrkete, Xêrî Beg ciyê wî digirt û Mîrantiya Êzîdiyan dikir. Ji sala 1975an û heya 1991ê, dema ku Tehsîn Beg ji ber rîcîma Îraqê reviyabû Ewropa, Xêrî Beg ciyê wî girtibû. Di dema wî de komîta ji bo çareserkirina pirsigirêka xêr û xératêni Êzîdiyan li Lalişa Nûranî hatibû damezrandin. Ew jî serokê vê destekê bû.

Di sala 1991ê de dema serhildan û berxwedana gelê kurd li dijî rîcîma Bexdayê, Mîr Xêrî Beg xwe tecvayî vê serhildana gelê xwe kiribû. Ew û rola wî di navbera rîxistinêni kurd de pir bi rû-

met û nav û deng bû. Mîr Xêrî Beg niwênerê perlementa kurdi li Kurdistana-Îraqê bû. Bi mirina



*Mîr Xêrî Beg kurê Se'îd Beg, kurê Alî Beg
wêne: arşîv*

Xêrî Beg, mirovekî me yî pir hêja û bi rûmet ji nava me diçe. Em gişt bi mirina wî dêşin, lê belê jiyan û mirin bi destêni Xwedê û Tawisî-Melek in. Em dibêjin: "Sed rehmet li rih û canê wî be, Xwedê û Tawisî-Melek wî bi rehma xwe şah bike."

Ragehandin

Di roja 01.06.1997 de Desteya Rêvebera Bingcha Êzîdiyan li Derveyî Welat (ÊZIA) û Komela Çand û Ola Êzîdiyan li Oldenburgê civîneke hevpişk li avayiyê Mala Êzîdiyan li Oldenburgê pêkanîn. Di civînê de serokê Bingeha Laliş li Dihokê besdar bû. Di axavtina bi xêrhatinê de herdu aliyan karên hev yên ji bo nasîna Êzîdîtiyê pîroz kir. Civîn bi giyanekî biratî derbas bû û ew gehîştin van biryaran:

1. Her yek li gor bernamê xwe ya serbixwe karên xwe bidomîne.
2. Pêwîst e, ku herdu alî di van xalan de hevkarî bikin:
 - Hevkarî di navbera weşanên herdu aliyan de hebe, bi arinzî di navbera kovara „Roj“ û „Dengê Êzîdiyan“ de û ji bo pêşvebirina herdukan.
 - Hevkarî hebe, nexasim ji aliye ÊZIA ve ji bo lidarxistina simînarân li Bingehê û li Mala Êzîdiyan.
 - Mirov divê ji Internetê ji bo belavkirina zanyariyeke dewlemdîr li ser Êzîdiyan fêde bigire.
 - Guhdancke arinzî li xort û zarokên Êzîdiyên li Elmanyayê bê kirin û dibistanên dersa dînî, komên mûzîkê, şano, ûhwd. ji wan re bên vekirin.
 - Xurtkirina danûstandinan li gel unîversite (zanîngehan), zanyar û komelên rewşenbîrî û destgehê din di seranserî Awrûpa û cihanê de bên danîn.
 - Hêzkirina têkeliyên li gel zanyarên oldarî û civata bilind ya Êzîdiyan li welat berdewam be.
 - Jiyankirin û pîrozkirina cejn, rê û rismên Êzîdiyan, hevkarî di navbera Bingehê û Mala Êzîdiyan hebe.
 - Di karê civakî û xêrxwaziya nava Êzîdiyan de herdu alî bi pirs û şewir bi hev re kar bikin.
 - ÊZIA û Mala Êzîdiyan li Oldenburgê bi fêrz zanîn, ku dergehê danûstandinê û ciwaniya hevkariyê vekirî bimîne ji bo hemî rêxistinê dinêñ Êzîdiyan.
 - Herdu aliya jî raspart, ku alîkariya „Bingeha Laliş li Dihokê“ bikin û têkiliyên xwe bi wê re xurt bikin, da ku ew bikaribin bitir li ser xizmeta xwe ya pîroz rawestin û wê bidomînin.

Ji bo geşkirina karê hevpişk di navbera herdu rêxistinan de û ji bo bicîanîna xalêñ jorîn biryar hat standin, ku civînê dem-demî bêñ kirin û da ku dergehê danûstandinê û hevkariyê ji bo xizmeta Êzîdiyatîyê tim vekirî bimîne.

Li Oldenburgê, Hezîran 1997



Desteya Rêvebera
Komela Çand û Ola Êzîdiyan
li Oldenburg



Desteya Rêvebera
Bingeha Êzîdiyan li Derveyî
Welat (ÊZIA)

Bîranîna Con S. Ges

Mixabin li roja 14.05.1997 Con S. Ges (John S. Guest) nivîserekî inglîzî emrê Xwedê kir û bi vê yekê Êzîdiyan dostekî dolsoz li dest da. Ew xêrxwazê Êzîdiyan bû, nexasme Êzîdiyên Hemdûna. Her wisa ewî li sala 1992 qesta Lalişê kir. Kitêbeke hêjâ li ser Êzîdiyan bi zimanê inglîzî û li sala 1988 çapkir.

Nachruf auf John S. Guest

Der englische Yezidenexperte und -freund John S. Guest ist am 14.05.1997 in Amerika im hohen Alter verstorben. Er hatte ein sehr gutes und herzliches Verhältnis zu den Yeziden. So hat er sich in seinem Leben des öfteren für die Interessen der Yeziden eingesetzt und sie finanziell unterstützt. U.a. hat er in dem in türkisch-Kurdistan gelegenen yezidischen Dorf Hamduna durch den Bau eines Brunnens die Wasserversorgung hergestellt. Auch auf dem wissenschaftlichen Gebiet hat er sich mit den Yeziden auseinandergesetzt.

Sein 1988 in englischer Sprache erschienene Buch "The Yezidis" enthält viele fundierte, insbesondere geschichtliche Informationen über das Yezidentum und ist ein Zeugnis dafür, daß es ihm im Gegensatz zu vielen anderen Autoren des Yezidentums ein ernsthaftes Anliegen war, die yezidische Religion in ihrer Ursprünglichkeit und vorurteilsfrei zu beschreiben. Die Yeziden werden ihm ein ehrendes Andenken bewahren.

Obituary to Mr John S. Guest

The english Yezidi-expert and friend John S. Guest died in his high age on 97/5/14 in America. He had a good and heartly relationship to the Yezidi. He often spent time and money for their future. Like this he buildt up a well in the village Hamduna. Also he set apart in a scientific way with the Yezidism.

His book "The Yezidis" appeared in 1988 and contains founded information about the yezidi culture and religion. He was seriously endeavoured to write correctly about the Yezidi. The Yezidis will honour a memory of him.



John S. Guest in the yezidi village Hamduna - photo taken from his book "The Yezidis"

Biryara dersêن ola Ezidiyan li başûrî Kurdistan

Me bi dilekî xweşbihist, ku xwendevanên Ezidiyan yên besa Kurdistanâna başûr ya rizgarkirî ji sinifa (klasa) 1. heya sinifa 6 dê li ser ol, ziman û çanda xwe di dibistanan de dersan bistinîn.

Ev mafek ji mafêñ me ye, ku em ji weke hemû mirovêñ li Kurdistanê dijîn, li ola xwe xwedî derbikevin û wê biparêzin.

Wekî din ji ev gavê hatiye avêtin, rûmet û serbilindî ye ji bo Komara Kurdistanâna rizgarkirî û hukûmeta wê. Wezîrgeha Perwerdê (fér-bûnê) libâşûrî Kurdistanîfermana xwe ya Nr.5637 ya ji tarîa 05.11.1996 de biryar stand, ku zarokên Ezidiyan dikarin di dibistanan herêmên ku ew lê dijîn de, dersêñ lis er ola xwe bigirin.

Li vir pêwist e, ku em bibêjin, ku

ev cara yekemîn e, Ezidî û zarokên wan di dibistanan Kurdistanê de dersan li ser ola Ezidîtiyê distinîn. Yekser biryar hate standin, ku 6000 heb eksemplar ji pirtûka Mamoste Pîr Xidir Silêman "Ezidîtiyê" bêçapkirin û li dibistanan Ezidiyan bêçapkirin.

Bi vî rengî zarokên Ezidiyan dêbi reyeke dirist û pak li ser ola xwe bibihîzin, bixwînin û zimanê dayîka xwe yê lepîp û şêrîn baştîr hînbîbin. Rêdaksiyona Dengê Ezidiyan spasîya xwe ji hemû berpirsyar û biryargirtêñ vê biryara pîroz re dibêje û gavêñ rind û baş û demen xweşîr ji gelê Kurdistanê re dixwaze. Her wiha em pêşveçûn, xweşî, yekîti û serfirazî ji gelê Kurdistanê re dixwazîn.

Rêdaksiyona Dengê Ezidiyan

Biryara Wezîrê Perwedê nekurtkiri:

**Herêma Kurdistanâna Îraqê
Encômena Wezîrî
Wezerata Perwerdê**

Birêveberiya giştî ya program û nezîyeva ferjîne pişka programî

Ji bo Rêveberiya giştî ya perwenda Duhîkê program û nezîyeva ola Ezidiyan

Nivîsina we, Hejmar, 5371, li 04/04/1996 û li ser deqê pêşniyaza komita helsengandina babêti ola Ezidiyan

Em razîne, ku kitêba Ezidîtiyê li çergehen devarêñ Ezidiyan hê xwendin. Daxwazîya me ev e, van xala bi ci binim:

1. Pêwist e, ku her klasik (sinifek) wanen xwe yên en taybetî biwxîne.
2. Klasa sesan serateyi vê salê taqîkirîna serê salê li vî babeti nebe, le polen din ji wan re hebe.
3. Em razîne, ku xolek ji bo marnosteyen wanebetî bêç vekirin, ji bo maweya heft rojan ji bo çawaniya vîbabeti.

Digel rîz û sipasiya me

Dr. Cercîs Hesen,
Wezîrê Perwerdê

Hejmar: 5637
Roj: 1996

Hevpeyvînek li gel mirovekî Êzîdî

Îro bêtir ji 32000 Êzîdî li Almaniya dijin û hejmara wan roj bi roj zêdetir dibe. Pir mirov pişta xwe didin welatê xwe û qesta welatên biyaniyê dikin û bi teybetî têne Almaniya. Li vir pirs tê hildan:



Şimzê - gundekî Êzîdiyan li baqûrî Kurdistanê

wêne: T. Tolâ

Gelo ji kengî ve Êzîdî hatine vir? Sedem çiye, ku van mirovan berên xwe didin derveyî welat? Gelo ramanêwan li ser pêşeroja zarokên wan çawa bûn? Ci kar û xebat pêk anîn, daku şewta êşen xwe zivik bikin û ji pirsgirêkên nebûyî û nebînayî re rê û çaran bibînin? Rê'aksiyon û bersiva rêber û zanyarên Êzîdiyan ji pirsên vê demê re ew bû, ku bêtir ji 10 Komelêñ Êzîdiyan hatin damezrandin. Zehmetkêşıya van komel û malan roj bi roj nîvişk dide û dara jiyana wan ber digre.

Berpirsyar û endamên aktiv hewl didine xwe ku ola bav û kalan bi zarok û nîşê nûhatî bidine zelal kirin.

Heke me ji tirsa xêrnexwaz û çavşoran heya berî demekê nikarîbû bibêjin, ku em miletê Tawisî-Melek in, îro em ji xwe re rûmet û serbilindayî dibînin, ku me ola xwe ya kevnar û rûsîpî parastiye. Em dixwazin di destpêka vê hevpeyvina bi rû-

sipîyekî Êzîdiyan re pirsa avakirin û damezrandina komel û malên Êzîdiyan zelal bikin û rola xêrxwazên Êzîdiyan di vê pirs-girêkê de bînin ber çavan. Ki piştgiriya me Êzîdiyan dikir û rê

xweşkirina rewşa van karkerêñ biyanî?

Mihemed: Ji me re yek pirs girîng bû: Pêwist bû em zû û ne dereng fêrî zimanê almanî bibin ji bo derbaskirina karêñ xwe. Di meha 7an ji sala 1970î de ez bûme berpirsyarê karkeran di wê karistanê de. Di vê demê de min Komelek damezrand ji bo çare-serktrina pirsgirêkên Karkeran û miletê me. Navê wê Komelê ev bû: "Türkische Gemeinde in Celle und Umgebung e.V." bi kurdi: "Komelgeha Tirkî li Selê û herêma we". Ji armancêñ wê komelê:

1. Naskirina rewş, rabûn û rûniştina gelê Alman, daku em ji problêman dûr bikevin û nexweş nekeve navbera me û gelê alman.
2. Çarekê ji malbatêñ xwe yên di şûna waran de mayîn, bibînin.
3. Me nameyek ji Komara Almaniyare şand, ku ew rê ji me re veke, her yek ji me mirovekî ji malbata xwe ji welat bîne Almaniya ji bo guhdana zarokan û daku jinêñ me ji bikariben herin kar.
4. Bi gotina hekûmeta Alman me ciyek ji xwe re girt. Heya bi 200 mirovî dikaribûn cî bigrin. Ev bûbû weke hêlinkekê ji me giştan re.
5. Pir caran dîtina xêniyan (malan) ji karkeran re zor bû. Me ev daxwazî dibir ber destêñ berpirsyarê bajêr, daku mirovên me bi hesanî xêniyan bibînin. Ev komel bûbû weke meferekê anji qestgehekê ji bo mirovên me.
6. Me cîhek li Selê ji xortan re girtibû. Nêzîkî 60 Xortî cî li wir digirt û dikanîbûn hînî mîkanîk bibin. Bi vî şeweyî ji wan re hesanî dibû, ku zûtir karekî di karistanêñ Almanan bibînin. Hindek pisporêñ Alman piştgiriya vî karî kirin.

Ji bo parastina çand û ola xwe ji me berxwedanek kiribû. Bî alîkariya profesorekî Alman Dr. Gernot Wießner rewşa me di vê pirs-

girêkê de baştir bû. Ji bo dîtina Êzîdiyan ew profesor hatibû Selê û alîkariya me kiribû, ku em komîteke birêvebir damezîrinin û pêwendiyên xwe bi Mîrê Şêxan re xurt bikin. Bi karê vê komîtê ez rabûm. Bêtir ji salekê jî me karê xwe berdewam kir.

Li gel ku me li welatê biyaniyê qûnax xweş kiribû, lê hiş û ramanê me li cem gelê me Kurd bû. Di slal 1976 erdhejandinek li herêma Wanê çê bû. Endam û dilxazâen komela me bi 7000 DM alîkariya gelê xwe yî bê sitar kiribûn.

Di van çend salên dawî de me mala xwe guhastibû bajarê Oldenbûrgê. Li vir me pê anîbû der, ku hejmarek baş ji xortên me Êzîdiyan bi firê ketine û zimanê almanî rind hîn bûne. Ji vê sedemê jî û ji bo parastîna nifşê nû, xort û keçen me, law û dotên me, me Komela Êzîdiyan ji bo çand û ola Êzîdîtiyê di sala 1993 an de anî jiyanê. Pir rewşenbîr, lêkolîvan û xwendevanê me cî tê de girtin û ez dikarim



Mihemedê Eli (Mehmet Tolan)

bibêjîm, ku serê me bi xebata wan her yî bilind e. Weşana DÊ ne hindik e. Avakirina navendeke olî li Oldenbûrgê girîngirîn kar e ji bo pêşerojê. Ez bawer im ku Tawisi-Melek li pişta me û

dê mirad û armancê xort û keçen me bi cî bîne.

DÊ: Li dawiya vê hevpeyvînê tu çi dixwazî ji gelê me re bibêjî? Mihemed: Ez dixwazim bibêjîm, ku pêwist e em gotina Xwedê û Tawisi-Melek pêk bînin: "Me ji tiştekî ne şerme, me ji tifaqê

şerme." Heke mirovîkî bixwaze xizmeta gelê xwe bike, xizmeta çand û ola xwe bike, pêwist e em piştgiriya wî bikin ne çav-soriyê lê bikin. Mesele ne mesele min e, meselc ne meseleke şexsî ye. Ev mesala ciavat Êzîdiyan ye.

Nameyek ji bo rêdaksiyona kovara Dengê Êzîdiyan

Rêz û silavên min li we bin, deşten we xweş bin, bi teybetü ji bo weşandina pênc hejmarên vê kovarê.

Bê guman weşandina kovareke weke vê kovarê li Elmaniya, ziman û çanda me bi pêş ve dibe û xurtir dike û dilên me Êzîdiyan ciwan vedigerîne. Ola me ciyê dilxweşîya me ye. Bi vî karî Êzîdiyên me, li vê xerîbiyê û welatê biyanî hînî rê û rismên dînê xwe dibin, fêrî zimanê kurdi yê şêrîn dibin.

Em bi dil û can karê we pîroz dîkin û dê li gorî taqeta xwe alîkariya we bikin, em piştgiriya we bê qedar dîkin. Çavê me di rêya hejmara 6an de qerîmî, di baweriya min de weşandina vê hejmarê tozekê dereng ket.

Her wiha dixwazim, ku xebata we di vî warî de xurtir bibe û ez di wê baweriyê de me, ku zimanê kurdi yê şêrîn, çanda me ya kevnar û rehkûr û ola me ya paqîj dê bi ser kevin.

Hêviya min jî ji we ew e, ku hûn lêkolineke rind û delal li ola me bikin, wê ji bin rebeniyê derxînin û bi dînya û alemê bidine naskirin. Ez dixwazim gotineke kurt ji xwendevanê me re diyarî bikim:

Me wisa bîhîstiye, ku bavekî Êzîdi ji kurê xwe re ev digot: "Kurê min! Şireta bavê xwe bike guhar

û têxe guhêñ xwe, gotina min li devê min nexîne. Ez dixwazim şireta rastiyê li te bikim, di rêya rastiyê de here, jiberku rêya rastiyê çiqas diçe her bi ronahî ye. Di rêya xwariyê de neçe, jiberku rêya xwariyê çiqas diçe dibe çiya, geliyêñ kûr, stirîn û kelem û tarî dibe.

Ji ber van sedeman pêwist e, ku tu her dem di rêya rastiyê de herî. Heke hat, ku carekê piyêñ te bişemîtin ser rêya nerast û xwar, dê dîsa werin ser rêya rast. Heke çavşor û zordest şevekê ziyan û nebaşyan nekin û xirabiyan negîhînin kesekî, ew di wê şevê de narazin.

Lê mirovîn ji rastiyê hesdîkin dibêjin Elhemdûlîlah, ya Rebî. Bi vê Di'ayê dilê wan paqîj û rihet dibe.

Birayê we Sadiq Duzgün

Serrastkirin

Di hejmara 5 da ya DÊ darbava Bavê Şêx li rûpelê 29 de hatibû weşandin.

Ev darbav ji berhevkirina hêja İhadî Bavê Şêx bû, lê mixabin navê wî nehatbû nivîsandin. Em sipasiya wî dîkin. Rêdaksiyona DÊ.

Rewşa Êzîdiyan li welat

Êzîdî, ew gelê Xwedênas û xwendî çand û ola kevnar, hên dijîn û rîya bav û Kalan bernedane, li gel ku bitenê sultanê Osmaniyan 72 ferman li wî rakirin û bi sedhezar jin, mîr û zarokêne nebih û nebîrawer kuştin anji bi destêne hirç û hovan dabûn kuştin û bi devê sur misilman kirin. Dilê azadiyan wan hên lîdixê û ji bo irf, edet, Di'a û Qewlêna ola wan her yî bi evîn e. Hejmara wan bêtir ji ¾ miliyon e, piraniya wan li Kurdistana Îraqê dimînin, prestgeha wan ya pîroz "Laliş" li Kurdistana Îraqê ye, Mîrê wan û serokê olê, "Bavê Şêx-Extiyarê Mergehê li Ba'adrê û Lalişê dimînin. Wekî din ji Êzîdî li Kurdistana Tirkîyê, Kurdistana Sûriyê, li Ermenistanê, İranê û Gurcistanê, hene.

Piraniya Êzîdiyên Kurdistana Tirkîyê cî û warê xwe berdan û koçber bûn. Ew bi teybeti hatin Almaniya.

Êzîdiyên welatên soyveta berê terqîyan welatên din, hindek ji wan li Ermenistanê dimînin, hindek li Gurcistanê û yên din rewiyan Ükrayîne, Rûsiya û welatên din li Ewropa. Êzîdiyên Sûriyê roj bi roj dikevin tengayîye û rewşa wan xirab dibe. Ji sala 1962 an ve û heya iro ew weke penaber anji mirovên biyanî bê nivûs in. Ne ji mafê wan e, ku erdê biçînin, xêniyên xwe nû bikin û qût û xwarinên bingehî, weke zeytê, çayê, şekir, birinc, rûn û genim, bi bihayê ji aliyê komarê hatiye danîn, bikirin. Lî wawaylêya mezin û bê pîvan ev e:

- Ola Êzîdîtiyê nayê dîtin weke olên din (Islam, Xaçperestî û cihûtî). Ew li cem Komara Sûriyê ne oleke serbixwe ye, lî belê

beşek ji İslâmî ye. Ji ber vê rastiyê ji ew zaroken Êzîdiyan di dibistanan de bi zor dişînin derza ola İslâmî û Qur'anî bi wan didin xwendin. Zimanê ola wan, zimanê kurdîye, ew jî qedexe ye.

- Zarokê Êzîdiyan, yê dê û bavê wan kitim in, ne ji mafê wan e. dibistanê bêtir ji kilasa gan berdewan bikin.

- Li gor biryara Komara Sûriyê ji sala 1962 an pêwist bû Êzîdî ciyê xwe berdin û herin nav ava şor û xweliya çemê Firatê hatîne. Xwedîkirina pez û dewaran ji zû ve hatiye birîn, çêrayî qedexe ye û cî li wan teng bûye. Bi yek hevokê em dikarin bibêjîn, ku jiyana Êzîdiyên li Sûriye ne tu jiyana, ew mirina hedî hedî ye. Rewşa Êzîdiyên Îraqê ne çêtir ji ya xuş û birayên wan li Sûriyê e. Recîma Bexdayê gundê wan li herêma Dihok û zaxoyê û ciyayê Şengalê wêran dike, talan dike û ji mirovan vale dike. Em dikarin rewşa wan bi şêweyî bidin xuyakirin:

- Diserhejmariyên gelên Îraqê de, yê di salên 1977 û 1987 pêk hatin, Êzîdî weke beşek anji elek ji elên ereban hatin dîtin. Her wiha wan digot, ku Êzîdî bixwe misilman in lê ji İslâmî dûr ketine û pêwist e, dîsa bikevin himbêza ola Mihemed.
- Zimanê dê û bavê wan, Kurdî qedexe ye.
- Nahêlin Êzîdî liser ola xwe di dibistanan de hîn bibin. Ji sala 1963 ve qedexe ye.
- Erd û axa Êzîdiyan ji wan standin û wan ji gundê wan derxîstin û koçber kirin û bi darê zorê xistîn kolanan, li dora van Kolanan ji leşkerên Sedam rawestiyane. Ereb anîne ciyê wan ji sala 1977an ve dest bi vî karî kirine û heya iro berdewam dibe. Di

fermanê 358 li 16.03.1978 Komara recîma Îraqê biryar dabû, ku erd û zeviyê Êzîdiyan ji wan werin standin û li ereban werin parckirin (belavkirin).

- Heft gundê Êzîdiyan li Welatê Şêxan ji wan standin û dabûne ereban. Çek û silah li ereban belavkirin û çek û silahên Êzîdiyan ji wan standin. Êzîdî gişt xistîn gundekî û erden wan li ereban belavkirin. Gund jî ev in: Meme Reşan, Baqesrê, Mehîmûd, Müqbele, Müseka, Cerwana û Kendal.

- Di sala 1978 an de Êzîdiyên 126 gundê ciyayê Şengalê bi kote û zorê xistîn 10 gundan.

- Heşt gundê Êzîdiyan li herêma Dihokê vale kirin û mirovân van gundan anîne Şariya

- Gundê herêma Elquşê bi zorê anîne gundê Şêxika û Nisêriyê.

- Gundiyyê herêma Feyde bi darê zorê anîne gundê Babîrê.

- Dehûsê gund li herêma Silîvanî kavlî kirin, Êzîdiyên êla Hewerîyan bi zorê ji wir derxistin.

- Dehûyke gundê Êzîdiyan li herêma Simêlê bi zorê şandin xanikê.

Heke mirovekî Êzîdî berxweda-neke aşî bikire û bigote, ku çîma komar gundê wan ji wan distîne û ereban dixe şûna wan, ew di çî de sergûn dikirin û dikuştin. Pir rewşenbîrên Êzîdiyan dane kuştin. Yek ji wan Mamoste Heyder Nezam ji Welatê Şêxan bû. Çavê recîma Îraqê her li rewşen bîrên Êzîdiyan ji welat. Piraniya van xorîn hêja çûn Ciyayê Kurdistana li cem pêşmergehîn rexistînên Kurdî, lê hindek ji wan jî reviyan Ewropa, weke Dr. Memo Osman, Dr. Xelîl Cindî û Dr. Derwêş Şero. Piştî serhildana bihara sala 1991ê 10 ji sedî ji Êzîdiyan ketin bin himbêza Kurdistan û 90 ji sedî mabûn di bin bandora recîma Îraqê de. Rewşa

Êzîdiyên di bin bandora partiyêن kurda de hin bi hin, roj bi roj baş dibû, heke PDK û YNK (Yekîti Niştimanî Kurdistanû PUKE Patriotic Union Kurdistans) bi hev neketine û mala bavê hev neşewitandise. Vi şerê fêde li Sedam û destikêن wî kir. Bi Sedam noker û destikên Sedam bi dizî ketin Kurdistanê û pir mirovên niştimanperwer, welatparêz û zanyar kuştin. Van mirovan ciyêن bilind di partiyên Kurdish de girtine û Karê xwe yê qirêj berde-wam dikin. Wekî din jî bandora partiyên alîriten İslâmê roj bi roj zêde dibe û çavşoriya li Êzîdiyan dikin. Bi teybetti di van herdu salêñ dawî de hinek melên misilman di mizgeft û camiyêñ Dihok û Semêlê de propaganda dikin, ku Êzîdî xwedenenas û kafir in. Pêwendî û axiftin bi wan re heram e, li ji aliyekeñ din ve keçen wan direvînin û bi zorê mehir dikin. Êzîdî ji tırsa İslâmê nikarin Keçen xwe ji wan bistîn. PDK ji hewl dabû xwe, ku van Keçan ji misilmanan bistîne, lê bê fêde bû. Bi yek hevokê mirov dikare bibêje, ku jiyana wan li nav Kurdish jî pir xirab e û tu parti û rêxistin nikare wan ji ber xêrnex-wazêñ wan biparêze. Kurdêñ misilman dikarin çaxê ser û rojêñ giran ji Dihokê birevin Silêmaniye û bajarêñ din. Lê Êzîdî ji ber ola xwe rev ji wan re tuneye. Recîma Baxsayê destûra ereban li kuştina Êzîdiyan dide. Berî 3 salan mirovckî ereb li nêzîkî gun-dekî Êzîdiyan li herêma Elquşê hatibû kuştin. Li gel ku wan nizanîbû bê çawa ev ereb hatiye kuştin, radibin 12 Xortêñ Êzîdî bê súc û guneh dikujin û kemînekê li pêşîya Mî Tehsîn Beg datîn û wî birîndar dikin û 2 mirovên ji eskorta wî dikujin. Birano! Ev e rastiya jiyana Êzîdiyan li Welat. Em di wê baweriye de ne, ku mamoste, rewşenbir û zanyarêñ

Êzîdiyan ji ber vê zilm û zordistiya bêxwedatî reviyan welatêniyê. Ne PDK û ne YNK nikarin destêñ xwe bidin ber Êzîdiyan û wan ji zilmê biparênin û bi teybetti çaxê pirsgirêk di navbera Êzîdiyan re tunin. Heya di besen Kurdistanê Yêñ rizgar-kirî de jî sitar ji Êzîdiyan re tune. Em gişt dizanin, ku 93 opozisiyonen İraqê li Erbilê htin kuştin. Heke bi rastî hêlinêk ji me re hebiye, cîma gelo MCC ji Zaxoyê rewiye Tirkîyê, gelo cîma Emrika bêtir ji 2500 mirovên Kurd jîn dilxwaz û hevalên we revandibû Emrika?

Rast e, ku Sedam û Komara wî Êzîdiyan giştan nakuje, lê belê Êzîdî ji hemû mafêñ mirovan mehrûm in. Heke niviskarek ji wan rabe û nerazîbûna xwe liser zilm û zoriya ku li Êzîdiyan di be, diyar bike, ew bê guman dê were kuştin.

**Ji ber vê Sedemê jî xûngerm, niviskar û rewşenbirêñ
Êzîdiyan reviyan welatêñ din, yêñ bîna mirovantiyê,
aştiyê û serbestiyê ji wan dibare.**

Mebest û daxweziya me êdî ne ew e, ku 600.000 Êzîdi welatê xwe berdin û birevin welatê biyaniyê, lê belê heke çend rewşenbir birevin anjî reviyanê welatêñ Ewropa, pêwest e werin hemandin, jiber ku vegera wan li welêt her kuştin, zindan û işkence ye. Heke Ewropa û welatêñ din destek anjî niwê-nerek şande Kurdistanê bila ne bitenê guhdariya rejîma İraqê anjî guhdariya çend mirovên tirsonek bike. Pêwest e ew li rastiyê bigerin. Bi kurtî: Ew rewşa xirab li welatê Êzîdiyan dihêle, ku Êzîdî ciyêñ xwe berdin û birevin Ewropa. Ma kî welatê xwe ji xweşî û këfa xwere berdaye?

SİZİN

İN
NE R

yapabileceğimizi

biliyormuydunuz



KARTVİZİ

YENİK USTESİ

BASLIK

MİKTUP KAÇITLARI

CİHİT

REKLAM

VE DAVETİYELER

BİZİ, DENGË ÊZİDIYAN!

ARAYIN,

ŞİZLER İÇİN SÜREKLİ
YARDIMA HAZIRIZ.

Yeziden in ihrer Heimat - Opfer doppelter Verfolgung

Obwohl die monotheistischen Yeziden in ihrer Geschichte zahlreichen Pogromen ausgesetzt waren, bei denen tausende unschuldige Menschen ihr Leben lassen mußten - allein in der Zeit des Osmanischen Reiches wurden 72 Vernichtungszüge gegen die Yeziden geführt - haben sie die jahrtausendalte Religion und Kultur ihrer Vorfahren bis heute nicht aufgegeben. In ihren Herzen pulsiert die Liebe zu ihrer Religion und der Wunsch nach Freiheit.

Die Gesamtmitgliederzahl der Yeziden übersteigt eine ¾ Million. Die Mehrheit (ca. 600.000) leben im Nordirak. Dort befindet sich das religiöse Zentrum Lalish. Das weltliche Oberhaupt der Yeziden Mir Tahsin Saied Beg residiert in Ba'adre, das ca. 20 Kilometer von Lalish entfernt ist. In Eyn Sufne hat das geistliche Oberhaupt Sheikh Khetu Baba-Sheikh seinen Sitz. Des weiteren leben Yeziden in Syrien, Armenien, Georgien und in der Türkei. Die Zahl der in der Türkei lebenden Yeziden hat sich in den letzten 25 Jahren von 20.000 auf 150 Mitglieder reduziert. Ein Großteil der aus diesem Gebiet stammenden Yeziden ist nach Deutschland geflüchtet, wo mittlerweile 30.000 Yeziden leben.

Von den bis vor ca. 10 Jahren in Armenien und Georgien lebenden 82.000 Yeziden blieben nunmehr 23.000 Yeziden in diesen Staaten, davon 22.000 in Armenien. Der Zerfall der Sowjetunion und die für die Yeziden einhergehende Verschlechterung ihrer Menschenrechte zwang sie, ihre Siedlungsgebiete aufzugeben und nach Rußland, in die Ukraine oder Europa zu flüchten.

Die Situation der in Syrien lebenden Yeziden verschlechtert sich zunehmend. In dem Bericht "Doppelte Minderheit: Die syrischen Yeziden im Spannungsfeld von Ethnizität und Religion" von Sebastian Maisel wird hierzu ausführlich Stellung genommen. Es sollen hier nur kurz die wichtigsten Punkte erwähnt sein, mit denen der syrische Staat die Grundrechte der Yeziden beschneidet und versucht sie zu assimilieren:

1. Der syrische Staat erkennt die seit Jahrhunderten in Syrien lebenden Yeziden nicht als gleichberechtigte Bürger zu den arabischen Bewohnern an. Den Yeziden sind die Staatsangehörigkeitsrechte versagt. Nur ein kleiner Teil der Yeziden sind aufgrund hoher Schmiergeldzahlungen an örtliche Beamten im Besitz der syrischen Staatsangehörigkeit. Sie werden als Fremde im eigenem Land behandelt. So wird der Besitz von Land und die landwirtschaftliche Nutzung nur in den seltensten Fällen erlaubt. Während der Staat die Grundnahrungsmittel für die syrischen Staatsangehörigen subventioniert, müssen die Yeziden ihre Nahrung zu überhöhten Preisen einkaufen.
2. Die yezidische Religion wird im Gegensatz zur islamischen, christlichen und jüdischen Religion nicht anerkannt. Der syrische Staat vertritt die Ansicht, daß es sich beim Yezidentum um eine islamische Sekte handelt. Yezidische Kinder werden gegen ihren Willen in den Schulen zur Teilnahme am Islamunterricht gezwungen. Der Gebrauch der kurdischen Sprache, in der auch die Gebete und anderen religiö-

sen Texte der Yeziden verfaßt sind, ist verboten.

3. Yezidische Kinder, die keine syrischen Staatsangehörige sind, dürfen höherbildende Schulen nicht besuchen.

4. Nach einem Erlass des syrischen Staates im Jahre 1962 mußten die Yeziden ihre Siedlungsgebiete verlassen. Ihnen wurden Gebiete zugewiesen, die durch eine schlechte Grundwasserversorgung und unfruchtbare Böden gekennzeichnet sind.

Die Situation der Yeziden im Irak ist vergleichbar mit der der Yeziden in Syrien. Nachfolgend werden die wichtigsten Punkte der Assimilierungspolitik des Iraks gegen die Yeziden genannt:

1. Bei den Volkszählungen, die im Jahre 1977 und 1987 im Irak durchgeführt wurden, wurden die Yeziden als eine arabische Volksgruppe bzw. Stamm registriert. Der Irak ist der Ansicht, daß die Yeziden ursprünglich Moslems waren und diese sich erst im Laufe der Zeit vom Islam distanziert haben.

Es ist ein ausgesprochenes Ziel des irakischen Regimes, den Yeziden ihre kurdische Identität zu entziehen und sie zu arabisieren. Die Yeziden sollen sich zum Islam bekennen.

2. Der Gebrauch der kurdischen Sprache ist für Kurden strengstens untersagt. Bedenkt man, daß die religiösen Texte der Yeziden im Gegensatz zum Islam in kurdischer Sprache abgefaßt wurden, stellt dieser Erlass für die Yeziden eine erhebliche Behinderung in ihrer Religionsausübung dar.

3. Seit 1963 ist an den Schulen yezidischer Religionsunterricht nicht erlaubt. Statt dessen werden die Kinder wie in Syrien gezwungen, am islamischen Religionsunterricht teilzunehmen.

4. Das Saddam Husseins Regime vertrieb gewaltsam viele Yeziden aus ihren seit Jahrhunderten angestammten Dörfern und ließ diese von Arabern bewohnen. Die zwangseigneten Yeziden wurden in großen Kunstdörfern zusammengefaßt. Diese lagerähnlichen Dörfer werden von den irakischen Soldaten strengstens bewacht. Die Vertreibungsaktionen und Umsiedlungen gehen auf einen Erlass des Iraks im Jahre 1978 zurück. Ziel ist es, die festen Dorf- und Sozialstrukturen der Yeziden zu zerschlagen und die Wahrhaftigkeit der Dörfer gegenüber Übergriffen von islamischen Fundamentalisten zu schwächen. Des Weiteren wird mit diesen Aktionen erreicht, daß die bisherige weitestgehend funktionierende Eigenversorgung der Yeziden durch landwirtschaftlichen Anbau aufgrund der nun schlechteren Bodenverhältnisse verloren geht. Nachfolgend seien nur einige Beispiele stellvertretend für diese Politik genannt:

- Im Sheikhan-Gebiet wurden sieben Dörfer den Yeziden gewaltsam entrissen und den Arabern überlassen. Während die Yeziden entwaffnet wurden, wurden die Araber bewaffnet. Die wehrlosen Yeziden wurden in ein aus dem Boden gestampften neuen Dorf umgesiedelt. Die Namen der Dörfer lauten: Meme Reshan, Baqesre, Mehmud, Muqbele, Museka, Cerwa und Kendal.
- Im Jahre 1978 wurden 126 yezidische Dörfer im Sinjar-Gebiet gewaltsam durch das iraki-

sche Regime auf zehn Dörfer reduziert.

- Acht yezidische Dörfer um die Stadt Duhok wurden zerstört. Die Einwohner wurden nach Shariya verschleppt.
- Die in den Dörfern im Elquish-Gebiet lebenden Yeziden wurden gezwungen in die Dörfer Sheikha und Niseriye umzusiedeln.
- Die Yeziden aus den Dörfern im Feyde-Gebiet mußten in das Dorf Babire umsiedeln.
- Im Silivani-Gebiet wurden 13 yezidische Dörfer zerstört. Der yezidische Stamm der Hewiri wurde mit Gewalt aus seinem Gebiet vertrieben.
- Die Yeziden im Simele-Gebiet mußten ihre 13 Dörfer aufgeben und in das Dorf Khanike umsiedeln.

Jeder Yezide, der versuchte, sich der gewaltamen und unrechtmäßigen irakischen Landnahme zu widersetzen bzw. politisch dieses Thema diskutierte, wurde festgenommen, verschleppt und in den meisten Fällen umgebracht. Besonders die yezidische Elite aus Persönlichkeiten und Intellektuellen wurde zur Zielscheibe des Irakregimes und zahlreiche mußten ihr Leben für ihre freiheitliche Überzeugung lassen. Dies ist auch ein Grund, warum viele yezidische Intellektuelle aus dem Irak flüchten. Viele haben sich den kurdischen Widerstandsorganisationen angeschlossen. Einige sind nach Europa geflohen. Nach dem Kuwait-Krieg 1991 erkämpften sich die Kurden eine Autonomie im Nordirak. Die yezidischen Siedlungsgebiete befinden sich jedoch lediglich zu 10% im kurdischen Autonomiegebiet. In dem vom Irak regierten Teil sind 90% des Siedlungsgebietes. Die Yeziden wurden durch die neu geschaffenen Grenzen von-

einander getrennt. Ein großes Problem ist, daß der Großteil der Yeziden vom religiösem Leben ihres Zentrums in Lalish abgeschnitten wurde, weil es sich im kurdischen Autonomiegebiet befindet. Zuerst verbesserte sich die Situation der Yeziden im kurdischen Teil. Der seit 1993 andauernde Brüderkrieg zwischen den kurdischen Parteien KDP und PUK verschlechterte jedoch wieder die Situation. Hunderte von irakischen Agenten wurden in das Autonomiegebiet eingeschleust. Sie führen im Auftrag des Irakregimes die Ermordungen wichtiger Oppositioneller und Persönlichkeiten aus und übernehmen unbemerkt in den kurdischen Parteien wichtige Positionen. Der Zuwachs der extrem-islamischen Parteien und ihren Anhängern in Kurdistan wird zu einer weiteren großen Bedrohung für die Yeziden.

In den letzten zwei Jahren wurden durch moslemische Geistliche in den Moscheen der Städte Duhok und Simele Haß und Verachtung gegen die Yeziden geschrüttet.

Islamische Fundamentalisten verbreiten die Auffassung, daß die Yeziden gottlos und ungläubig seien. Der Umgang mit Yeziden wird als unrein bezeichnet und sie werden als mitverantwortlich für die schlechte Situation gemacht. Die durch den Krieg verarmte und hungernde Bevölkerung ist leicht für derartige Gedanken der Fundamentalisten zu gewinnen, daß auch die Yeziden für die schlechte Situation verantwortlich sind. Islamisierungsbestrebungen und Übergriffe auf Yeziden im kurdischen Autonomiegebiet häufen sich. In der letzten Zeit wurden wieder ver-

stärkt yezidische Frauen von Moslems entführt und zur Annahme des moslemischen Glaubens gezwungen. Die yezidische Minderheit ist nicht in der Lage, sich gegen diese menschenverachtenden Handlungen zu wehren. Dies zeigt, daß Yeziden der Willkür der Moslems ausgesetzt sind. Zwar bekunden die kurdischen Parteien, sich für die Rechte der Yeziden einzusetzen. Sie sind jedoch unter anderem aufgrund des Brüderkrieges nicht in der Lage, den Yeziden ausreichend Schutz zu gewähren.

Das irakische Regime hat der arabischen Bevölkerung die Yeziden de facto zum Töten freigegeben. Entsprechende Übergriffe der arabischen Moslems gegen Yeziden werden strafrechtlich nicht verfolgt. 1994 wurde ein arabischer Iraker in der Nähe eines yezidischen Dorfes im El-qush-Gebiet ermordet. Die Angehörigen des Ermordeten beschuldigten grundlos die Yeziden und töteten zwölf yezidische Jugendliche. Hinzu kommt, daß von diesen Personen ein Anschlag auf das Oberhaupt der Yeziden Mir Tahsin Saied Beg verübt wurde, bei dem er schwer verletzt wurde, und zwei seiner Begleiter dem Kugelfeuer erlagen. Die Untätigkeit des irakischen Regimes ergibt sich nicht nur aus der Passivität einzelner Dienststellen, sondern entspricht der Gesamtrendenz einer Rechtsordnung, die die privilegierte Stellung der Moslems als selbstverständlich ansieht. Die kurdenfeindliche Politik des Iraks äußert sich in ihrer gesamten Härte in der Unterdrückung der Yeziden. Während über 90% der Kurden durch die Islamisierung viele arabische Traditionen und Angehörigkeiten übernommen haben, haben die Yeziden ihre ursprüng-

liche kurdische Identität nicht aufgegeben. Das Yezidentum, das somit als die Quelle des Kurdenstums gilt, will der Irak vernichten und seine Anhänger islamisieren. Die Angriffe des Iraks gegen die Kurden treffen zuerst die yezidischen Kurden als schwächstes Glied in der Kette, der im Irak lebenden Minderheiten.

Das staatliche Straf- und Familienrecht Iraks bietet den Yeziden keinen hinreichenden Schutz. Anders als für Christen, Juden und moslemische Kurden sieht das irakische Familienrecht keine Sonderbestimmungen für Yeziden z.B. beim Religionsunterricht vor. Dem einzelnen Yeziden werden immer wieder bei der Arbeit, der Lebensmittelbeschaffung und ähnlichen Verrichtungen des täglichen Lebens beim notwendigen oder zufälligen Zusammentreffen mit Angehörigen der religiösen Mehrheitsbevölkerung schwere Kränkungen oder wirtschaftliche Behinderungen zugefügt oder angedroht. Diese ständige Bedrohung prägt die Alltagserfahrung der Yeziden. Er muß sich die Unsicherheit, in der die Yeziden auch durch die in den alltäglichen Vorfällen liegende Bedrohung leben, insoweit zurechnen lassen, als er auch eine nachträgliche Ahndung von Übergriffen unterläßt, was nach den Beweisergebnissen regelmäßig geschieht und dadurch die Täter ermuntert, weiterhin mutwillig und rücksichtslos ihren yezidischen Nachbarn Schaden zufügen oder sie zu provozieren oder zu bewältigen.

Es ist davon auszugehen, daß der irakische Staat trotz bestehender Schutzhörigkeit nicht willens ist, mit dem ihm zur Verfügung stehenden strafprozeßualen Mitteln einer Verfolgung der Yeziden durch Moslime entgegenzuwir-

ken. Nicht jede Untat wird vom Staat direkt veranlaßt. Er hat jedoch ein System geschaffen, mit dem er wenn nicht immer unmittelbar so doch mittelbar die yezidische Identität auszulöschen versucht.

Zusammenfassung

Die Yeziden sind Mitglieder einer Gruppe, die als solche erheblichen Rechtsverletzungen in deren Heimatgebieten ausgesetzt ist. Eine derartige Gruppenverfolgung liegt vor, wenn eine durch gemeinsame Merkmale - hier die kurdische Volks- und yezidische Religionszugehörigkeit - verbundene Gruppe als solche Ziel politischer Verfolgungsmaßnahmen ist. Die yezidischen Gruppenmitglieder müssen Rechtsgutbeinträchtigungen erleiden, aus deren Intensität und Häufigkeit jedes einzelne Gruppenmitglied die begründete Flucht herleiten kann, selbst alsbald ein Opfer solcher Verfolgungsmaßnahmen zu werden. Weder die Yeziden in den kurdischen Autonomiegebieten noch die Yeziden im Irak sind vor Übergriffen des im Nahen Osten zunehmenden islamischen Fundamentalismus und den Arabisierungsbestrebungen des irakischen Regimes geschützt. Demzufolge kann eine inländische Fluchtautomatic nicht in Betracht gezogen werden. Abschließend kann festgestellt werden, daß die Situation der Yeziden über das allgemeine schwere Los der Kurden hinaus geht. Die aggressionsgeladene, jederzeit zu Gewaltausbrüchen oder Demütigungen zu Lasten der Yeziden tendierende Situation im Gesamtirak zwingt daher die Yeziden zunehmend ihre seit Jahrhunderten angestammte Heimat zu verlassen.

Rewşa Êzîdiyêñ Ermenistanê - Ez di welatê xwe de jî hêsîr im Eskerê Boyik

Ez nivîskarekî kurd im, ji Ermenistanê me û Êzîdi me. Ji ber zilm û zordesiya komara Ermenistanê û çeteyên nasiyonalist, yên bi devê komarê hatine damezrandin, reviyam vî welaü. Ez diwê baweriyyê de me, ku li vir tu mirov rewşa kurdên Ermenistanê baş nizane. Wisa diyar e, ku desteka mafê penaþeriyê tu cudadabûnê naxe navbera kurdên Ermenistanê û Ermeniyâ.

Rêform û diristikirinê ku salên 80yî de di çarçofeya perestroyika Gorbaçov de bi kar hatin nasiyonalizimî û başverûbûn pir peyda bûn û komik û partiyêñ hişknetewî meydan ji mirovên dêmocrat û pêşverûyan standin. Di şerê ciyayê Qerbaxê de bîyar ji aliyê van grupêñ çekdar û komara cî hate standin, ku di vê herêmê de bitenê Ermenî bijîn û bimînin. Gelên din weke rûsan, azariyan kurdan, belerûs û aşûriyan mecbûr kirin ku ciyê xwe berdin. Ev terqiyen hemû deveran. Armanca Ermeniyâ ji vê gavê ev bû, ku ev welat bi wan bitêne bimîne.

**Di navbera 2 salan de
Ermenyan bi sedhezaran
mirovêñ Ne-Ermenî ji
Ermenistanê derxistin, bê ku
koma cihanê û welatên din
vî tiştî bibihîzin.**

Ji bo ku ev planê wan pêk were her roj li gund û bajaran bi metîngêñ rasistî radibûn û pir tîrîn jehrî ditavêtin bi aliyê van miletên kêmketî û hindik. Li her cihî Fidayiyêñ çekdar hatin teşkîkirin. Wan çavreşî li gelên Ne-Ermenî dikirin. Ma gelo ev Fi-

dayî kî bûn? Bi dîtina me, û ev jî rastiya rewşe ye, ev hemû diz, mîrkuj û sixtekar bûn. Rûpelên wan her berê jî reş bûn, wan tu karekî xêre nekiribû. Heke çend caran hatibin girtin lê belê disa dihatin berdan û vê carê bi temamî heqaret li gelên bindest dikirin. Karê wan bûbû weke çaxê gur bikeve nav keriye pezê bê şivan. Lî wisa diyar bû, ku ev ji van çavşoran nebes bû. Ëdî cete û pêxwasên çekdar meydan standin û dest bi zikreşî û çavşoriyyêñ xwe kirin.

Wan bi devê komarê êrîşî qcîleyên leşker û polisan dikirin û çek didizîn. Pir zordestî li mirovên aşûxwaz û bêgazin dikirin. Malên wan dişewitandin û li ser deriyêñ malên wan dînîvisin: "Birevin, herin! Nexwena dê ji we re pir xirab bikeve". Pir mirov talan dikirin, mal û meydanêñ wan bi darê zorê ji wan distandin, mekinê (girgirokêñ) wan dibirin, lê gel nikaribû li ber xwe bixe û mafê xwe bixwaze. Lîdan, çêr û şorêne nebaş tiştî normal bûn. Her wiha zilm li Êzîdiyan ji dikirin.

Kurdekkî Êzîdi ji bajarê Êrivanê, navê xwe Alîk Hasanyan bû, hate girtin û li ber çavêñ hezar mirovî hat şewtandin. Ew hatibû bigunehkirin, keçek û xortekî ermenî kuştîye. Paşî hate diyarkirin, ku ne wî ew kuştibûn. Haj û gumanên wî di kuştina herdu mirovan tunebû. Êzîdiyekî din ji herêma Artaşatê dane ber gulan û bê sûc û guneh kuştin. Zilm û çavşoriya wan ne ev herdu tişt bitenê bûn. Serekkomara Ermenistanê, Levon Ter Petrosian, di Kongra Fidayiyê Ermenistanê de,

ya sala 1993 pêk hatibû digot, ku van teşkilat û rêxistinê çekdar welat ji milet û gelên Ne-Ermenî paqîkirin. Wî digot, ku milê çekdar yê HHŞ bi vî karê bi rûmet rabuye. Pir mirov ji tırsa wan û serokê wan ciyê xwe berdan û terqiyen welat û şaristanê dûr.

Di vê demê de mirov dikare bêje, ku 98% ji gelê Ermenistanê Ermenî ne. Heke hindek Êzîdi mabin ji, ew bê guman kal û pîr in û bê çar û mical in û nikarin xwe tevhev bilebitin. Keda wan ya sedsala bi avê ve çû. Organîzasyon û rêxistinê ji bo mafê mirovan û koma cihanê bi tiştî nabihîzin. Dibe ku ev pirsgirêk ji wanre ne hewqasî giring bû. Çavêñ wan her mabû li şerê navbera Ermeniyî û Ezeriyan, şerê ciyayê Qerebabê û hilweşandina welatên Sovyetistanê. Bi dîtina wan gelên Ne-Ermenî welat ji ber sedemên aborî (ekonomî) diberdan û ne ji ber zilm û serdestiyyêñ Komara Ermenistanê.

**Li gel ku hewqas zilm û zorî
li Ermenistanê heye, disa ji
ev welat bûye endamê çend
rêxistinê dîmokrat û hewl
dide xwe ku bibe endamê
civata niwênerên Ewropayê
ji, kurd li wir bê maf in.**

Bi hezaran reviyan Rusiya, lê belê nizanin dê di pêşerojê de ci bi şerê wan were. Gelo Rusiya ji dê fermana wan diyar bike, anji wan ji welatê xwe bavêje? Tişték hîn ne diyar e. Propagendekê pir bi qirêj li dijî gelê kurd dibe. Zanyar û hov, baş û nebaş, gişt li dijî gelê kurd kar dikin û tîren jehrî davêjin wan. Ne sitar ji wan re maye û ne ji hêlin nekirine. Ligel ku hejmara kurdan, Êzîdi û Ne-Êzîdi ne bêtir ji 60 hezarî ye, ew di wê baweriyyê de ne, ku çavêñ kurdan li avakirina Kur-

distanekê li ser axa Ermenistanê ye.

Her wiha dibêjin, ku kurd destekên Tirkiyê ne û çavê wan lê ye, ku beşek ji Ermenistanê bixin nava Kurdistanê.

Bi van bêbextiyan wan pir mirovén Ermenî rakirin piyan û dijminatiya kurdan di dilên wande çandin. Heke hindek Ermenî xwedî xêr û rûmet ev bêbextî qebûl nekire, wî didîtin weke dijmin û noker. Rewş wisa lê hatibû, ku cîran û cîran ji hev re bûne dijmin. Lê pîsîtiya mezin



Êzîdiyên Ermenistanê û Guorstanê

ew bû, ku wan dixwest Êzîdiyan ji kurdan dûr bixinin. Wan digot, ku Êzîdî ne kurd in, ew gelekî serbixwe ne û tu girêdana wan bi kurdan ve tune. Di hejmartina gelên wî welatî de Êzîdî cuda hejmartin. Wan digot, ku geneh gunehê nivîskar û rewşenbîrên kurdan e. Çima heyâ ûro Êzîdî weke beşek ji gelê Kurd dihatin dîtin. Lê em dibêjin, ku ev tişt ne bingeh jê re heye û neşî rastî. Em dibêjin, ku Êzîdî kaniya gelê kurd e, kurdên esîl Êzîdî ne. Erê rast e ola Êzîdiyê ne maye ola hemû kurdan, lê belê wekî gel em kurd in.

Rewşenbîrên kurdan, Êzîdî û Ne-Êzîdî li dijî vê dîtinê rawestiyen. Pir Êzîdî ji ber vê çavşoriyê ji reviyan û hên direvin. Heke rê û cara ji wan re hebe, dê hemû birevin. Gel pir perşan û haltengezar bû, teqiyabû li hemû welatê Sovyetistana berê. Êdî bira hew dizanîbû birayê wî li ku welatî maye.

Ew ji hemû aliyan ve bûye koçer û penaberê bê çî û war. Extiyarîn, ku bêtir ji cil salî kar kiribûn, mane bê mi'aş û zorê li wan dikin, daku welatê xwe berdin. Ji wan re dibêjin: Herin welatê xwe!!! Lê welatê wan li ku ye? Em bawer in, ku tu kes qîfîna bindestan seh nake. Komara Ermenistanê du rû ye: Ji aliyeke ve dixwaze hemî gelên Ne-Ermenî ji Ermenisanê derxîne û ji aliye din ve ji propagende dike, ku komara wan li ser bingehê demokratî û wekhevî ava bûye û Êzîdî serbest in û rewşa wan xweş e. Ü heke hindik ji Ermenistê direvin, ew

ji ber rewşa aborî ye ne ji ber zilm û zordestiyê ye. Lê em wê perda ku wê bi ser serê xwe dakiye, dilihîmin û riwê wê yê rastî ji cîhanê re diyar dîkin. Êzîdî kar di wezifetên komari de nabînin. Berî niha Kolxoza hebûn. Di wan Kolxozan de Êzîdiyan kar dikirin. Ew li wir rênber bûn. Îro ew Kolxoza jî rabûne. Êzîdî di paqîkirina bajaran de kar dikirin. Îro ew ji ji destê wan çuye. Heke rewş wisa bidomîne, dê Êzîdî di Ermenistanê û welatên de biqelin û ji cîhanê hilin. Ew çanda kevnar dê hunda bibe û ev dê bibe rûreşıya Ko-

mara Ermenistanê. Car carne Êzîdî ji şewta laşê xwe direvin bi aliye sînorê Tirkîyê û dixwazin derbasî wî welatê ku fermana kurdan tê de rabûye. Êzîdî ditirsin cîhanê pê bihesînin. Ew newêrin bi serbestî bibêjin, ku zimanê wan kurdî ye anjî mafêñ wan di Ermenistanê de hene. Heke gotinek bigihîje rojevên cîhanê jî, wan digot, ku zilm li Ermenistanê tune û gel her serbest e.

Heke Yekîtiya Sovyetistanê di salên 30 de hindek tişt ji Kurdan re serbest kiribû, ew jî hatiye hilweşandin. Berê rojnama "Rêya Taza" hebû, akadêmiya kurdan hebû, dibistanê bi zimanê kurdî hebûn. Îro ew tişt tune. Hemû tişt ketiye destê çeteyên çekdar. Komara Ermenistanê bi réxistinê nasionalist ve, weke PYUNIK, HINÇAK HAYASTANÎ, LIRAGIR, êrişike pir bi qirêj dikşînin ser rewşenbîrên kurd. Wan weke noker, destik û dûvikên xérnexwazên Ermenistanê dibînin.

 حين مددت يدي الى جرحه ، كانت طعنة حادة أعمى عرفت أن الذي طعنه ، حاقد من أحمقه ، على فرساننا .

آن.....
 قم ، أيها الحبيب دلال ، فلتقم ، قامق عروسيه ، لأجلك يا حبيبي قامق عروسيه ، جيبي ناصع وضاء
 حواجي دقيقة ، رموشى سوداء فاجة ، عيناي حوراوان مكحلتان من أجلك ،
 وجهي وردي ، خدماي تفاحتان من تفاح خلاطيه ، بيضاوان وحرراوان ، آنفي دقيق وناعم كمنقار طير مائي ، مقلل بخزام
 ذهبي ، شفتاين دققنان كحرب الورود ، ححجرتي ناحلة كتبينة عطر ، تذكري ذقني ملساء ، كملعقة شمشيت في مدينة
 الشام ، حين توضع في ماء الخناء ، قرطاً أذني ذهبيان ، متليلان حتى نهايات عنقي ، مصنوعان بيد المعلمين والصاغة
 المهرة في مدينة دياربكر المعروفة.

زناري لفظي هزتين بالمرايا ، حلمتاي ملباتان في ثورم صدرى ، كعبات رمان مدينة ملاطية
 على رأسى شال كسرروانية مزينة بالشناسيل الملعوبة ، ضفرتاي بستان ، لأجلك تلوحان في الريح يا حبيبي
 أنا يمامه شنكال الشحالى ، بطة الخابور الجنوبي ، اوزة الفرات الهدار ، ابنة الباشا الملللى ،
 على أرض الدنى كلها ، لست لافتة لأحد ، لست لافتة بابن عمى أوسي على ولا بمحو باشا ذي الركاب الذهبي ،
 لست لافتة بكل فرسان الملللين ، ولا بيلال ذي الرمح ، أو مستى الجلخي
 لست لافتة بعاشر العيسى أو جول ابراهيم التركى
 ما أنا لافتة الا بابن عصدى الازيدى ، لشارب دلال السوسي الفاقع
 وبعد دلال ، أنا لافتة لمقرة شنكال المعروفة ، للقير المدهم المظلم.

فلاكمت يا حبيبي ، بعدك لن أدبر شؤون بيت أحد ، لن أعد القهوة اليمنية لأحد ، ولن أحملها في ديوان الباشا الملللى الـ
 أحد. عهدا ، آنني لن أحقق مراد أحد معنى ،
 ولن أزيدن قامق العروسيه لأحد
 ولن أنوح على مهد أو سرير طفل ، ذات يوم.
 ماصعد قمم الجبال ، وصخور التحدرات ، وأنده دلال ، وأنوح.
 سأجوب البراري وأقول دلال ، وأصدق ملء صوتي ، مع دمعي الدامية ،
 سأقول دلال ، ياضيف بيت والدي
 ماصعد الاماكن الوعرة ، والجبال العالية ، وحين ستطير اليمامات وأسرايب الحجل ، سأقول دلال ،
 مع صوت أساور يدي ، ورنينها ، حين الروح بهما ، سأقول دلال
 مع أصوات المؤذنين وتكتيراتهم ،
 وصفير الرعاة وأصواتهم في الجبال والبراري
 سأقول دلال ، وأنده ملء صوتي دلال
 بعدك لا أريد الحياة ، ولا مات
 ماضع رأسى على شاهدة حجرية ،
 وأصبح ضيفة وعروسة الفرسان.

Destana Aşıq Xerîb û Şah-Senem

Ev destana han min di sala 1989 an de li gundê Rembûsî li Şengalê jiber devê sitranvan û dengbêjê bi nav û deng Qasimê Meyro girtiye û nivisiye. Hêje gotinên, ku dibêjin, şûnwarên wî bi navê "Aşıq" li Îraqê hene. Lêkolîn li ser vê destanê çênebû ye. Ez vî derî ji bo xwendevanên hêjare dihêlim.

Bedel Feqîr Hecî

Li welatê Helebê malbateke reben û belengaz hebû, dê û bav, qizek û lawek bûn. Navê kur Xerîb bû. Xerîb kurekî pêkhatî û jîrek bû. Sal û demêñ giran û tarî bi ser wan ve hatin. Bav dimre û halê wan pir perişan dibe. Mirovên wî bajarî ji wan re ne baş bûn û tu alikarî bi wanre nekirin. Bi ser halê wan yê perişan ve jî, wan kenê xwe bi wan dikir û bi şêweyekî berûvajî henekên xwe bi wan dikirin. Dayîkê digote herdu zarokên xwe, ku çûna wan ji vî bajarî baştire, ji mabûna wan di rebeniyê û perişaniyê de û baştire ji pêkenîna û bêxwedêtiya vî miletî. Em dê herine welatekî dûr û nenas. Heke em li wir parsê jî bikin, dê baştir be ji jiyana me li vî bajarî.

Ji xwe ev bêmal bûn, rabûn ji cilêñ rihêñ xwe û pêde bi xwe re nebirin. Bi rê ve ketin û li ci gundiñ anjî bajarî li wan dibû êvar, ew wê şevê li wir diman û roja din bi zeraya rojê re didane rê. Bi vî hali rojekî gîhiştin pêxên bajarekî mezin. Dayîkê ji herdu zarokên xwere digot, ku ew dê işev li ber sitara vê qesrê (avaniyê) xew bikin. Jiberku bajar yî mezin e û jibo em ji ser hev neqetin, baştire, ku em neçin nava wî. Xwedanê qesrê ber êvarkî derdikeve ser banê qesra xwe, dixwest bîna xwe bi dîtina bax û bistanêñ xwe û nerfîna bajêr berde. Çavê wî bi wê malbata belengaz diket û dilê wî bi halê wan dişewitî. Xwe berdabû xwarê û ji jina xwe re digot, ku ew şîvekê ji bo xêra dê û bavan ji wan re dibe. Rêwingî her xerîb in û xerîb her tim kor e. Şev li wan derbas dibû, roj dihilat lê belê hêja ew li wir bûn. Bi vî miqamî jina wî taşte û firavîn jî jiwanre dibir. Her li wir diman û nedîçûn.

Wî ji xwere digot, ku ev mirov ne bê hevalin û ji qesrê hate xwarê çû cem wan, jibo bizanîbe ci hewalê wane. Ji wan dipîrsî, heke ew diçin anjî dimînin û kî li vî bajarî nasdikin.

Dayîka wan digot, ku ew bêkesin, xerîbin û ji welatê Helebê hatine û nizanîn dê bi kur ve herin. Wan ne ci ye nejî war e û me xwe li Xwedê û li vî bajarî girtiye. Xwedanê qesrê, digot wan, ku ew dikarin

bikevine axurekê ji axurêñ qesra wî û dê jiyanê wisa derbas bikim, ka heyâ Xedê çarekê ji wanre bibîne. Malxuyê malê qewêtiya wan mirovan li jina xwe kir, ku guhdanê li wan bike û şiv, taşte û firavîn jîbîr neke. Diya zarokan ji wî mirovê camêr dipîrsî û dixwest bizanîbe, ku ew ci bajar e. Xwedanê qesrê digot, ku ew bajar, bajarê Bexdayê ye. Heke rojek, heke du roj di wê navê de derbas dibûn, diya herdu şewiyan digot herdu zarokan, ku pêwist e, em ji qenciyekê bi vê mala bi xelat bikin û desten xwe bavêjine karekî wan. Serê şeveqê ew radibû hewş dimaşt, av dikişand û nanê wan li tendûrê dixist.

Dibêjin rojekê ji rojén xwedê disa malxuyê malê derdikeve ser qesra xwe û bala xwe dide hawîrdora qesra xwe. Çavê wî bi wî lawikê sêwî dikeve, dibîne bê çawa cilêñ li wî lê rîzî û bi pîne ne. Wisa dibêjin, ku wî bitenê mecidîyek di bêrîka xwe de didît û wî mecidî ji dide diya wî, ji bo ew caw ji cilê kurik re bikire. Mirovên bajêr jî kurik bi "Xerîbo" bi nav dikirin. Ji bo (ronatiya) axurê jî, malxuyê malê her şev mûmek (findek) dida wan. Dibêjin şevekê ji şevêñ Xwedê der û ber qar dibin, şev tarî û bêdeng e. Ji nişkê ve dengek tê û dibêje: Xerîb, Xerîb...

Xerîb di bala wî de, ku ew di xwe de ye û xewnekê dibîne. Lê disa her ew deng dibêje: Xerîb rabe ser xwe, ev ne xewne nejî xeyale! Ez Xidir Ilyasim, sivikê Padişayê xwe yê li jor im û ez şandime, ji bo ez mirad û daxwaziyên te bi ci bînim! Tu bixwazî, ez dê te bixme şivanekî baş, anjî cotyarekî çalak û jêhatî, anjî aşiqekî dengzelal û xweş (sitranvan û dengbêj). Di destpêkê de Xerîb ditirse, lê belê hate hişê xwe, ku ev dîtina wî ne xewne. Dabû hişê xwe û digot Xidir Ilyasê, sivikê Xwedê, ku dê pêşî bi dayîka xwe bişêwire.

Çawa lawik ji xew re dibêje: Heke tu bibî şivan, dê şivantîyê ji xelkê re bikî û heke tu bibî cotyarek, disa tu rîncberê xelkê yî. Na wele baştir e, ku tu jê bixwazî, bila te bike helbestvanek, sitranvanek, tembûrvanek. Xerîb bi dilekî xwes xewkir. Derengî şevê Xidir Ilyasê, sivikê Xwedê, disa wî hişyarkir û pê re diaixift. Xerîb daxwaziya xwe digotyê. Xidir Ilyas tembûra quđretê xista desten wî, tiliyên wî danîbû ser têl û perdan û xuziya xwe bi devê wî dabû. Eşqê li dilê wî dabû. Dayîkê dît, ku Xerîb bi şev radibe û ne li ser nivîna xwe ye û dengê wî ji derve tê. Diya wî tîrsiye û bawer kir, ku cinik hatine Xerîb û wî dîn û bêhiş kirine. Xerîb digot, ku wî li tembûrê nedaye, bitene tiliyên xwe li ser têl û perdên wê danîne. Ji nişkê ve wî qîrkiribû

sitranan bi dengekî xweş û zelal, jê dihat keserên evîndaran, eşqa bûk û zavan.

Xerîb ji dayîka xwe xwest, ku ew tembûrekê jêrcikire. Ruyê xwe qewîn kir û digot: Pêwist e, tu ji min re çarekê bikî. Çiqas dayîka wî xwe bi vir ve û wir ve dabû, her bêfêde bû. Rabû ew mecidiyê, ku malxuyê malê dabûyê, wê ji dabû Xerîb. Xerîb jî bi nav bajêr ket û sitranê xwe dibêje û gehi ti tewîne û gehjî ditewîne. Mirovan xwe ji wî dûr dikirin, diketin şekê û dilqusandinê, ku ew dîn e. Xerîb bi pirskirê digihîşt dikana tembûran, lê belê ciger nekir, ku here cem osteyê tembûran (hoste). Li tîra dikanê rûnişt û agadarî li hoste û miştirîyên wî dikir. Carekê dîtibû, ku çend xortêni ji malbatêñ dewlemend û semiyandar cûne dikanê û li bîhayê tembûran diper-sîn. Tembûra erzan bi penc zêran bû, û rebenê xwedê mecidîyekî wî hebu. Hoste pişî xwarina haverojê (firavînê) disa tembûr çekirîn û rastkirin. Her wisa wî Xerîb li dev deriyê dikana xwe dîtibû û dît, ku ew hêve li wir e. Xwedanê dikanê diçê cem Xerîb, dixwest ji wî bipirse, ka derdê wî çiye. Wî digot, ku ew dixwaze tembûrekê ji xwe re bikire, lê pir biha û giran in. Xwediyê dikanê digotyê, ku tembûr bi mecidîyekî tunin û pêwist e,



Kurdistan

ew ji ber dikana wî here. Xerîb digotiyê, ku bê tembûr ji dikanê dernakeve, nexwe ew dê heya mirinê li dev deriyê dikana wî be. Xwediyê dikanê digot: Qurban! Xwedê nehêle, ez dê tembûreke bi bîhayê 2 mecidîyan ji te re çêkim, mecidîyek ji cem te û yê din bila xêra dê û bavê min be.

Çavê Xerîb bi tembûreke delal û bi zêrê zer neqîşandî hatibû çekirin, ket û ji xwe re digot, ku ev tembûr bû, Xidir Ilyasê min dabû himbêza min. Çavê her li wê tembûrê mabû. Xwediyê dikanê digot, ku ew tembûr ne ya têstêñ wî ye. Wî digot: Dê nexwe bîhêle ez wê biramîsim. Necar destûra wî dabû, lê çawa tembûr kete nav lepêñ wî, necar gotiyê: De lêxe, lêxe!! Bi soz heke te baş lêxist, ez dê tembûreke baş bidime te. Xerîb hem li tembûrê xist, hemji sitrand. Hingî deng û awazên wî xweş bûn, xwediyê dikanê sau û hêbet girt û hew dixwest ne

tembûrê ji destan derxîne, nejî stranan bi wê bide seknandin. Cade û zokaka dikan têde bû, tijî mirov bûn û bi hezaran li Xerîb û tembûra wî seyr û temaşê kirin.

Sê roj û sê şevan wan mirovên temaşevan ne razan hebû û nejî xwarin û vexwarin. Her guhdarî li deng û awazên Xerîb dikirin.

Xerîb li malê diyar nebû û dayîka wî giriyabû û bidest axîn, nalîn û keseran kiribû. Xwedanê qesrê dengê wê bîhist û wisa dilê wî li jina wî quasiye, ku dilê van belengazan hiştiya, anjî xwarin ji wan bîriye. Lê belê dayîka herdu sêwîyan rastiya kurê xwe jê re got. Xwedanê qesrê qîr dabû rîncber, çawîş û kolêñ xwe û ji wan xwest, ku vî lawîkî bibî-nin, heke sax (hêne li jiyanê), heke mirî. Serwerê van mirovan 2 kes şandibû nava bajêr, ji bo li wî kurî bigerin. Lê ew çûn û nevegeriyan. Çara 2ân serwerê çawîşan, çawîşekî pir zîrek şande bajêr. Wî dît, ku bi hezaran mirov li cadekê kom bûne û dengê tembûr û sitranan tê. Hingî awazên Xerîb xweş û bi şewat bûn, ew mirovên wî bajarî neçûn malen xwe her sê roj û sê şevan li ser piyêñ xwe rawstîyan, bê nan û av û bê xew. Xwedanê dikanê (firoşkerê tembûran) ev

wêne: G. Prieß

tembûra zérin diayî kir ji bo Xerîb û digot, ku bitenê ew layqî tîlyen Xerîb in. Mirovên bajêr ji wê rojê û pêde navê wî danîn "Aşiq Xerîb". Dibêjin, ku Aşiq Xerîb roj bi roj bi nav û deng bû û bi teybetî mirovên semiyandar û dewlemend wî dibirin şevbêrkên xwe û pir alîkarî bi wî re dikirin. Bajarê Bexdayê bi awaz û sitranê wî pir kêfxwêş dibû. Lawêñ her cil serokêñ bajarê Bexdayê bûne destûbirakêñ wî û bi şev û roj bêî wî tebata wan nedihat.

Şevbêrikên wan li gel Aşiq Xerîb her li mala xwedanê qesrê yî merd bûn. Lîbelê carekê ji caran ji hevdu re gotin, ku wisa naçe serî, hem tim li mala wî mirovî bin. Wan bîyar sitandin, ku quesrekê ji Aşiq Xerîb re bidine avakirin. Erdeke xweş ji bo avakirina quesra Aşiq Xerîb destnîşan dabûn û ji xwediyê wê kirin. Di demeke kurt de wan quesreke xweşik û bê qisûr (kêmanî) ava kirin. Her şev karê wan kêt û

seyran bû, tembûr û sitran bû. Her şev her cil li cem yekî ji wan komdibûn jibokû navbera wan û jinêن wan xirab nebe wan digotin Aşiq: Yan emê jinêن xwe berdin, anjî tu jî bizewice. Hevalên Aşiq Xerîb digot, ku ew gunehêن van jinan naxe stûyêh xwe û dê bizewice. Hevalên Aşiq Xerîb rojek destnîşan kirin û gotin miletê bajêr, ku tu kes ji mala xwe dernekeve lê çiqas qîzen bajêr pewiste, derkevin meydana bajêr jîbo kû Aşiq Xerîb wan bibîne. Heke Aşiq Xerîb yek ji wan eciband emê jê re bixne bûk û biguhêzin.

Yek jî bidilê Aşiq Xerîb tunebû. Li aliyê cadê yî din keleheke mezin hebû û keçekte pir xweşik û xwîşêrin têde bû. Gava çavê Aşiq Xerîb pê ket, ne bi dilekî dil ketiyê, bi heft dilan dil ketiyê û li ser wê aşiq bû. Lê dipirsin û dizanibûn, ku navê wê Şah-Senem e, dotmama Şahweled e û xwestiya wî ye (dergistiya wî ye). Bavê wê jî wê jiber vê sedemê jî neşandibû cadê, ta kû Aşiq Xerîb wê bibîne. Hevalên Aşiq Xerîb çûne xwestina wê ji bavê wê, û sûnda mezin xwarin, ku wê ji Aşiq Xerîb re bînin, lê pêwist e bi dilê wê jî be. Mirovêkî gotinger û fitneşî li mala bavê keçikê bû. Navê wî Beko-Ewan bû. Ew mirovê yekemin bû bihîstibû, ku Aşiq Xerîb evîndarê wê keçê ye û her cil hevalên wî têne xwestina wê. Bavê keçê bi şewirdarê xwe ve Beko, ew keçik nehiştin derkeve cadê û Aşiq Xerîbê xwe bibîne. Her cil hevalên Aşiq ev tişt bihîstin û çûna mala bavê keçê û gotin, ku ev ne karê ew bû, ku Şah-Senem xwestiya pismamê xwe ye û dê semawenda wan di heftiya werê de çêbikin. Wan digotî heke bi dilê wê be, ji xwe pîroz be ji pismamê xwe re û heke evîndara Aşiq bê em dê bizor anjî bi xweşî ji te bistînîn û qelenê xwe jî bixwaze! Guneh giranin û em bêdilî wê nakin. Bavê keçê li gel hevalên Aşiq çûne oda keçikê û jê dipirsin, ka baweriyyêن wê ci ne. Dibe, ku dilê wê di heft salêن dawîde bi pismamê wê ve bû, lê pîşti çavêن wê bi Aşiq diket, hiş û sewdanê wê li cem diman û bi heft dilan dilketibû wî.

Şah-Senem digot, ku bi dilê wê ye û dixaze bibejîna Aşiq û heke bavê wê li dijî vê zewacê be, ew dê xwe bikuje. Beko û bavê keçê tu çarên din ji xwe re nedîtin û digotin, ku qelenê wan heft bar pere ye, û ev perêñ han pêwist e, ne ji berîkêñ we bin û nejî ji bajarê Bexdayê bin. Ev qelen pêwist e, ne ji keda destêñ wî be. Çareke din tune. Hindeke ji wan dixwestin bavê wê bixapîñin û hindeke jî kuştina wî danibûn ber çavan. Lê hevalên wan digotin, ku me bext û soz dabû bavê wê û ew ne li bextê xwe diqulibin nejî sozê hunda dikin.

Bavê Şah-Senem cil roj molet dabû wan. Heke heyâ roja cilşertê xwe bi cî nekirin, ew dê qîza xwe li

biraziyê xwe mehir bike. Mirovên bajêr pir melûl û dilşikestî bûn bi van şertan û bi çûna Aşiq Xerîb. Mehelê xatiran, Aşiq Xerîb û bi her cil hevalin xwe ve hatin wî ciyê Şah-Senem cara pêşî lê dîtibûn. Ew cî jî li tîra qesra bavê wê bû. Aşiq Xerîb dest avête tembûra xwe ya zêrin.

Çavên wî bi Şah-Senem diket û distirand:

Şah-Senema min yî delal e

Negirî û nenale

Hêstiran ji çavên belek vemale

Giriyê te bi şewat û tal e.

Berevanê Birca-Belek tê nalenale

vê gavê û seetê bi xatirê te û xuşk û hogir û hevalan

Şah-Senem digot:

Aşiq Xerîbê min dê here Heleba-Mîran

Cî û Welatêن bav û bavpîran

Ditîrsim dilê te li wir bikeve keçen began, eyanet û wezîran.

Ditîrsim tu Şah-Senema xwe li wir bik ji bîre.

Ü tu Şah-Senema xwe paşî li bajarê Bexdayê nekî êsire.

Aşiq Xerîb digot:

Şah-Senema min yî bi erkan e.

Hemlê (barê) bavê te li milê min gelekî giran e

Qelenê Şah-Senema min ji min dixwazin heft barên perane.

Weleh min dizanibû hemû Beko-Ewan e.

Şah-Senem digot:

Aşiq Xerîbê mino, min dizanibû Beko-Ewan sebeb e.

Ü heke tu çuyî Şarê Helebê

guhê te li Şah-Senema te be.

Tu li wê derê ji Şah-Senema xwe xafil nebe.

Aşiq Xerîb dilezîne:

Xatir ji dayîk û xuşkê,

holdaş û Şah-Senemê dixwstîne

Xwe bi cada berbijêr diberdîne

Sîwarekî li rexê bajêr dibîne

Sîwaro! Min bi te û te bi Xwedê,

qûnaxa te kudere û kuder nîne!

Siwar digot: Tu ka carekê were xwe bi min bigihîne

Lingê xwe di rikêba min deyne

Ew siwar sihê Aşiq Xerîb disiwarîne

Rihê Aşiq Xerîb disiwarîne

Hebû deqîqeyek dû nîne

ji Bexda bi şarê Heleba-Mîran dighîne

Aşiq Xerîb bala xwe dayê,

ku bi heft dehol û Zirneyan Şahî ne

Aşiq Xerîbe xwe bi wê şahiyê dighîne

Dibêje gelî biran min xwe li Xwedê
 û we li vî şarî girtîne
 Min Hevsurek ji xwe re xwestîne
 Û hebek malê min nîne
 Qelenê wê heft barên peran ji min xwestîne

Wan digot:
 Heke tu aşiq bî ka saza te nîne

Wî digot:
 Ji min re çongerekê (tembûrekê) bînin
 Ezê ji we re lêxînim
 Heke dilên we ne ecbînin
 Nesîbê min li cem we, li vî Şarî nîne.

Çongerekê ji Aşiq Xerîbire tînin
 Li ser çoka xwe datîne
 Izin ji Xidir Ilyas dixwestîne
 Gava destêن xwe lêdixîne, kire qîrîne
 Aşiqêن dawetê sazêن xwe hemû danîne
 Aşiq Xerîb lêdixine, çarde rêzêن dilanê dikemline
 Aşiq Xerîb sîuheş rojan û danekî lêdixîne
 Şeş bar û cemek peran ji wî re komkirîne
 Mî'adê Aşiq Xerîb û Şah-Senem
 ji xeynî rojek û danekî ne-mayîne.

Şah-Senem dil bi kul e, bi birîn e
 Ne dixwar û nejî vedixwar û xewa wê ji nîne.
 Ü tu beşî nahebîne.
 Daweta Şah-Senem û Şah-Weled li darxistîne
 Şah-Senem dil bi kul û bi birîne.
 Ü serê xwe bi xem datîne
 Xwenekê di wê xewa xwe de dibîne
 Di wê xewnê de didît bazirganekî
 li binya bajarê Bexdayê
 Di wê xwê de Şah-Senem qesta
 başbazirgan danîne dikirîne
 İlmekî xêrê di wê xewnê de
 Şah-Senem ji Aşiq Xerîb dihiltîne
 Bi tebeqa Birca-Belek ve derketîne
 Bi dûrebînê li binya Şarê Bexdayê çavan digerîne
 Dêhnê xwe dayê, ku xewin rast e, şik têde nîne.
 Şah-Senem li oda bûkantîyê xwe
 bi xemla bûkan dixemline
 Xêl û sıpiçala hevrêsimî bi ser bejna zirav ve dixuşîne
 Ü haja kesî ji Şah-Senem-Xatûnê nîne.
 Xwe di cadêن Bexdayê de berbijêr berdayîne
 Li miqabilî Xîbeta başbazirganî ketîne
 Digrî û dilomîne

Başbazirgan gotiyê:
 Şah-Senema min ye naz e

Tu digri hêstirêن xwe bi bejna xwe
 ya zirav ve berde gaz bigaze.
 Tu hatî bibirsî li halê Aşiq Xerîb, Xerîbê belengaze
 Tu pirs dikî, başbazirgan bi xwe Xidir Ilyas e
 Min ji Şah-Senema xwe re hasil kir ev miraze

Şah-Senem digot:
 Başbazirgan tu Xwedê bihebîne
 Ü tê'na li ruyê Şah-Senem-Xatûna xwe nexîne
 Dilê min yî bi kul e û bi birîn e.
 Heke tu tê nan li ruyê Şah-Senem xatûna xwe dixîne
 Toqek di gerdena min de ye, ye quđretî ye û zérîn e
 Bi qîmetê bazirganê te ji binî tine
 Min digot, belkî tê cewabeke Xêrê ji min re bîne
 Ka hal û hewalêن Aşiq Xerîb,
 Xerîbê gêti li şarê Heleba mîran cî ne.
 Ji min re bêje, Aşiq Xerîb yî sax e anji mirî ne

Wî digot:
 Şah-Senema min yî bikir
 Nav û dengê te li dînyayê bûne dikir
 Te qesta xîva başbazirganê xwe kir
 Nasbîki Xidir Ilyas û Xidir
 Min ev miraz ji te re hasildikir

Şah-Senem digot:
 Xidir Ilyaso! Min bi te, te bi rebê alemîne
 Deng li bazirganê xwe bike, zû hilîne
 Xwe zû bi Heleba-Mîran ve bîgilîne
 Aşiq Xerîbê min ji govend û dilanê derîne
 Şiqamekê tu li Aşiq Xerîbe min bide û tu neêşîne
 Aşiq Xerîb gelekî li ber dilê min yî şerîne
 Ü heke tu Aşiq Xerîbê min bêşîni
 Tu li şarê Bexdayê kizûra mirinê
 li dilê Şah-Senema xatûna

Şah-Senem çavêن xwe li ser hev datîne
 Ü çavêن xwe ditîne û dihiltîne.
 Xiv û bazirgan nîne
 Xidir Ilyasê kar bi xêr xwe bi Heleba Mîran digihîne
 Bang dikir : Aşiq!
 Hemûkan digot: Belê!
 Wî digot: Min divê Aşiq Xerîbê, Xerîb Gêtî
 Gazi kirinê: Tu yî Aşiq Xerîbê, Xerîb Gêtî!
 Digot: Belê!
 Digot: Şah-Senemê silavan li te dike û gotiye
 Şiqamekê le wî bide û emanet tu wî neêşîne

Sûna şiqamê destê xwe li sûreta
 Aşiq Xerîb xe û xulkê wî bixeyîne
 Ü gotiye silava lê bike û jê re bêje:
 Min ehde, ji min û Aşiq Xerîbî re

ji xeynî roj û danekî nemayîne.
 Digot: Ka te çend bar komkirîne!
 Digot: Min Şeş bar û cemek komkirîne
 Digot: Bihêle û bişemrîne
 Nesîbê te di van peran de nîne

Aşıq Xerîb hate cem şahiyê, li cem aşiqan digot:
 Hûn xêr jê bibînin, yeqîn e, nesîbê min tê de tinîne.
 Aşıq Xerîb lingê xwe li ser lingê Xidir Ilyas datîne
 Xidir Ilyas iznê ji rebil alemin xwestîne
 Dihilanîn û danîne û cavan li
 binya bajarê Bexdayê digihîne
 Aşıq Xerîb çavêن xwe dihiltîne:
 Yeqin Bexda ye û Heleb nîne
 Bala xwe dayê qîzekê ji xwe re
 sergîn û qırşan vedihewîne
 Û pê re digrî û dilomîne
 Qesta wê keçikê kirîne
 Bala xwe dayê xuşka wî ji herdu çavan kor buyîne
 Hema piçekî erdê li ber lingê xw e dibîne
 Nasdiskir Xuşka wî ye: Xuşkê roja te bi xêr be!
 Wê digot: Ser çavêن min hafîne
 Wi digot: Xuşkê ev çi bajare, kûder nîne?
 Wê digot: U hu ..., neku tu xerîb bî, ev bajarê Bexda ye.
 Digot: Xuşkê! Li şarê Bexdaye têdengê şahî,
 dahol û zîrnê. Ev çi tişt e?
 Wê digot: Bira! Tu here, kulên dilê min ducar neke
 Birinê dilê min çîqekê bi rû ketîne
 Ü here xwe bi vê şahiyê ve bighîne
 Şüxlê te li cem min nîne.
 Wî digot: Xuşkê! ez mirovekî xerîb im,
 tu kesî nasnakim û dê işev li cem we bim.
 Wê digot: Nanê te li cem me nîne
 û em mêvanan nahewînin.
 Wî dipirsî: Gelo çîma hûn min nahewînin,
 ez xerîb im ji welatê Helebê hatime û ez tu kesî
 nasnakim?
 Wê digot: Wey li min be, birakî min ji hebû,
 çû welatê Helebê. Em li vir xerîb û bê kes hiştin,
 em nizanin ci bi wî hat. Gelo haja û gumanêن te ji
 wî tinîne?
 Wî digot: Ne xêr! min tişt li ser wî nebihîstiye.
 De ji min re bêje, ev çi bajar e?
 Wê digot: Ev Bexda ye!
 Wî digot: Tu bi qedrê padşahê joñî kî,
 çîma tu giñî, çaxê min li ser vê şahîye û wî dengê
 dehol û zîrnê dikir?
 Wê digot: Ev dezgîrana bîrayê min bû, wî berê xwe
 dabû Heleba şewîti ji bo qelenê bavê bûkê bîne,
 lê ew çû û nevegeriye. İro tu ji hatî û birêن dilê min
 dîsa vedikî. Ez ji bajêr reviyam,
 ji bo dengê vê şahiyê nekeve guhêن min.

Du diya min ji kesen xerîb nahewîne.
 Ev cil rojên me çebûn, ku em digrîn.
 Lê belê tu ji weke birayê min xerîb î,
 de were işev mala me!

Dayîkê ji qebûl dikir, ku xerîb wê Xerîb rûnişt û
 çavêن wî bi tembûra wî ket , û her cil xorten
 hevalen wî nikarîbûn desten xwe bidine tembûre,
 jiberku wê xwe nedide desten wan.

Xerîb digot:
 Dayê pîrê, tu destûra min bidî,
 ez bênekê li vê tembûre bixim?
 Bi vê tembûre dixwazim kulen dilê xwe derxînim.

Dayîkê digot:
 Tu ci mîvanekî bi tekir û mekir î
 Heke te şîv xwariye, taşcê li cem me nîne
 Kul û birînê dilê min tu neveke
 û here oxira te ya xêrê be.

Xerîb digot:
 Dayê pîrê, xwe nekerbîne, min tiştek negotiye.
 Tu bi qedrê Xwedê kî, bîhêle ez li tembûre bixim.
 Diya wî tu çarên din ji xwe re nedît û digot wî,
 heke ew karibe
 raje tembûre, bila lêxîne.
 Çawa Xerîb desten xwe bi aliye tembûre ve dirêjkir.
 Tembûre xwe sipartibû wî û wî ji wê li ser çoka
 xwe danî, paqî kir û tîlyen xwe bi ser perdên
 tembûre re birin û deng û xurmîn ji têlan anî.

Aşıq Xerîb digot:
 Hey dinyayê! Ez ji mal çum, maleke têr û tişî,
 Ez hatim maleke vale û fehma wê dîsa bûye rijî.
 Hey dinyayê xuşka min ye pak e
 Xwedê aqil û sewdan li serê te xirakir
 Çawa tu Aşıq Xerîbê Gêtî, birayê xwe nas nekir

Aşıq Xerîb dilezîne
 Tembûre dihiletîne
 Xwe li devê derî dixîne
 Dayîk û xuşka wî kor in nabînin

Dîgotin: Me ne em dizanin Aşıq Xerîb nû miriye
 Her yek ji wan kevirekî li sîngâ xwe dixîne
 û şîneke giran datînin
 Aşıq Xerîb çû û nedîtin

Her cil hevalen Aşıq Xerîb û mirovin dilsoz û xwedî
 soz bûn. Ew cil roj derbas dibûn, ku ew neçûne
 malen xwe. Biryar standibûn, ku heke Şah-Senem

bê guhestin, dê xwînê birijînin. Aşiq Xerîb digihiş cem wan û her ew di wê rewşê de ne. Lê wan ew nas nekirin, sîlav li wan kir, wan jî silava wî vedan. Aşiq tembûra xwe diyar kir, ji dakû wî nas bekin û bizanibin, ku ew Aşiqê tembûrvan û dengbêj e.

Yekî jî wan digot: Hey dinyayê, tu jî Aşiq î, de here cem vê şahiya li dar, tê jî xwe re perêkî baş kom bikî.

Aşiq digot wan: Xwezî min bizanibe ev ci bela we ye, hûn wisa dilmelûl in?

Yekî din digot: Tu ji cem me here, ti karê te li cem me tune.

Yê din digot: ka piçekî ji me re lêxe, iro bitenê ji me re maye, erê tu ji kur hatî û tu kî yî?

Aşiq digot: Ez mirovekî xerîb im û ji welateê Helebê hatim.

Wan digot: Tu bi qedrê Xwedê kî ci ilmê te ji hevalê me heye? Gelo te tiştek ji wî nebihîstiye? İro daweta Şah-Senem û Şah-Weled e û siba dê wê bighêzin û me qirar daye, ku dinyaye bi ser serên xwe ve hûşmin heke wan ev tişt birne serî.

Aşiq Xerîb tembûr li ser çoka xwe danî û qîrek dabû: Ev dinyake pûç e, derwîn e û kewna vê dinyayê pir şêrîn e Nif'eta tu kurêن bavan jê tunîne Ez bilbilim û rebat im Ji sibê heya êvaraê ez wek rebat û bilbilan dixwînim Ez xwedanê tembûra quđretî perde zêrîn im Awirêñ min gulêñ mîrinê saçîrmêñ jehrê ne Ez nav û dilê dijminan pê dipertînim Ü heke ez serê xwe li her çar qurmêñ dinyayê biêxînim Ez heval û holdaşan weke yên xwe nabînim.

Yekî ji hevalên wî digot:

Dilê min yî bi pîrte pîrte. Tu bi Xwedê kî, tu Aşiq Xerîb î anji şagirt e? Digot: Birayo! Ez Aşiq im, Aşiqê zor im. Ez Xwedanê tembûra quđretî perde bi mor im Heyf û mixabin Şah-Weled zava ye û bira zava li dorê rûnişî ne Heyf û mixabim sibê dê biguhêzin Şah-Senema min ya sore

Birano! Dilê min bi kîne-kîne gehrê dilêñ heval û holdaşen min girtîne, Wesyeta Şah-Senemê, Xidir Ilyas destêñ xwe li ser rûyê Aşiq Xerîb datîne Xulqê wî dijuherîne Bisekinin aqil û sewdan xwe bi serê xwe bînîn Heke ne ez Aşiq Xerîb bim, gumana min ji hevalê we Aşiq Xerîb nîne.

Wan hevdu nas kirin û geh kenîn û geh jî girîn û dilşad dibûn. Xwe avêtin stuyêñ hevdu. Di cî de tev çûne cem dirwarçiyekî û destek cilêñ ser hev jê re dane çêkrin û hemû çûne ciyê sersokê û xwe şuştin û xwe bi xemil û rewş kirin. Wan dabû racengî hevdu û Aşiq diket pêşîya wan. Xelkê li cadê ew nas kirin û ew jî gihiştin wan û ber bi dîwana zava û birazavan de diçûn.

Dîlan digere, aşiq û hunermendan digotin û xelk tê de germ bûbûn. Tev li tîra zavê rawestiyâñ. Wan jî Aşiq nas kiri.

Aşiq Xerîb tembûra xwe li ser çoka xwe danîbû û wisa digot:

Ez Aşiq im, Aşiqê ji mîj im

Ez xwedanê tembûra quđretî perde dirêj im Awirêñ min gulêñ mirinê saçîrmêñ jehrê ne ezê li nava zava û birazavan bipertînim.

Min dît li dîwanê bûbû pirtepirte û bira çû bira nedigirte

Yek beziye û gihişte cem Şah-Senem digote: Aşiqek hatiye nizanim ne Aşiq Xerîb e nejî şagirte e.

Şah-Senem digot:

Qasido bilezîne û serê min li dora serê xwe bigerîne Ilm û cewabek xêrê ji min re bîne

Toqeñî gerdena min quđretî zêrîne

Ew qîmeta bajarê Bexdayê tîne

Mizgîn û bexşîş tu ji xatûne xwe bistîne.

Yek ji gel digot:

Dayîk û Xuşka Aşiq Xerîb, ku ew hatiye û dibe ku ew kurê we be, min mîzgîniya xwe divê. Xidir Ilyas kevîkek dabû Aşiq Xerîb, wî jî bi ser û çavêndayêk û Xuşka xwe dakir û ew vege riyan weke berê. Qazîdê berê hatiye derê dîwanê û tam û esih zanîbû, ku ew mirov Aşiq Xerîb e.

Dîsa zivirî cem Şah-Senemê û digot:

Şah-Senemê dilê min bi pirtepirte

Zava û birazava yekî yek nedigirte

Min pirs kir ew Aşiq Xerîb e û ne şagirt e.

Şah-Senem dihilhilîne

Destê qasidê xwe sê caran diramîse

Û li ser serê xwe datîne

Xwedê serê min li dora serê te bigerîne

Tu cemedâ dilê Xatûna xwe dihêli de dipêlinî

Destê xwe li gerdena xelawî di qırka hêli de dipêlinî.

Kîlîla toq difikîne

Toq ji gerden hêli dertîne

Di destê qasidê xwe de datîne
 Qasido! Tu xêrê li herdu dinyayan jê bibînî
 Yeqîn bike ji Rebil-alamîne
 Qîmetê nîvê bajarê Baxdayê tîne.
 Şah-Senem Xatûn xwe bi oda bûkantiyê digihîne
 Xeml û xêza xwa ya bûkantiyê ji mal dertîne
 Bejin û bala xwe ya zirav û nazik pê dixemlîne
 Çavêن belek ji kilê sibhanî barkirine
 Lingên xwe di şimikên Entabê de dixîne
 Xêl û sipî çola hevrîsim bi ser bejna
 xwe ya zirav de dixusîne
 Ü haja keseikî ji Şah-Senem Xatûnê nîne
 Ü qesta dîwana zava û bîrazava bi lingên xwe kirîne.
 Li derê dîwanê sekinî, li wan dikir silave:
 Xêl û sipî çala herîri bilind kir ji ser herdu çavan:
 Serê min biqurban be, dîwana
 Aşiq Xerîb lê rûniştîn li nave.

Şah-Senem hat û gote xuşka Aşiq Xerîb:
 Here çîqekê bi wê de û digot:
 Xuşka Şah-Senem rêka min û rêka bîre
 Hêstirêن min nediketin avan û kaniyan û xedîran.
 Ü ez di bextê te de gazinan ji min neke,
 Aşiq Xerîb bîrakê min yê şîr e.

Digot: Dayîka wî bi wir ve here da ez li cem

Aşiqê xwe rûnim!

Dayîkê lê vegerand û digot:

Şah-Senema minê

Sê wextan min dabû Aşiq Xerîb şîre
 û heft salan ez bi Aşiq Xerîbê xwe re bûm êsîre
 Cîl rojî min Aşiq Xerîb nedît, ez dibûm kore

Şah-Senem digot:

Dayê pîrê heke tu naçî bi wir ve
 Xwedê wekil be ezê niha xwe
 bîhetikînim û rûnim di dawê de.
 Şah-Weled çavêن xwe dîgerîne
 ji birazava yekî jî li dora xwe nabîne
 û bala xwe dayê, ku tiştekî xêrê
 li ba heval û holdaşen Aşiq Xerîb nîne.

Lewma got:

Geli camêran hûnê Xwedê bihebînin
 Vê kîf û şâhiyê me biterkînin
 Hûnê Şah-Senem ji Aşiq Xerîb re biguhêzin
 û berdêliya wê ji min re xuşka Aşiq Xerîb bînin.

Xuşka Aşiq Xerîb ji Şah-Weled re guhastin û Şah-Senem ji Aşiq Xerîb re guhastin. Gava Aşiq Xerîb quesda koza wê kir Emîn Cibrayîl rihê herduyan distîne.

Basinbar

bi tevzînokê canê xweyi
 xilmaş
 ezê meyâ hinarkên teyî
 berebat
 lêvê kenok
 bino
 şî
 nim
 û.....
 li ser gerdena elendê
 dê te bihûnim
 basimbarek
 ji kes...
 ke...
 so...
 rê

Hoşeng Broka

Geli Ezidiyan

Geli şêx, pîr û pêşîmaman
 Çıqas mirîd, feqîr û merebiyan
 Hemû koçek, qewal û mîran!
 Ma ne bes ji van derd û kulan
 Hisyarbibin bala xwe bidene dewran
 Bi kurve diçen ew urf û edatan
 Qey kes wek me ne hate alman

Ka ew sed û hedêن bapîran
 Rêz û rêzanêن me yî ji bo îman
 Ka ew rojên me yên id û êrefatan
 Ka ew tifaqên me yên berî salan
 Ew tevger û bervedana dostan
 Ka ew hes kirin û berketina dilan
 Ka yekîtiya keç, kur û malbatan
 Lihevxdîcerketina jin û mîran
 Bi kurve diçen ew qîz û xorêt ciwan
 Gelo çîma em hija jî wiha bê semiyan in?
 Kî here û em destê xwe nedîn berwan
 Emê tevdek bivin bê xwedî û xwedan
 Pêşeroj dê me jî bike hevalê menfe' etan

Bavê Şêran

Qîrîna bindestan

Şûrên dudev li ser gerdenê, sê car digotin bide eşhedê
 Dest girêdayî, çav girtî, dil bi kutekut, celad erdê vedide
 Li her cihî barîbû agir û pêt, ji Derdilê heyâ bi Serhedê
 Serî difirandin, xwîn dipijiqî, didane selewatan ber navê Pêxemberên Xwedê
 Dikuştin jin û zarokên li ber himbêzan û ew mirovên diçûn kedê.

Şêx û melên bi şasik û cube digotin: „Ew kesên Îzîdiyan bikuje,
 Pêwist e, dest kesik bike û xwîna wan tev bimije“
 Qîrdikirin sofiyan: „Sofino! Hûn xilas dibin ji canem û dojê!
 Çil horiyên gerden dirêj li benda we ne, kêt û seyran e, bi şev û rojê.“

Zarok mane birçî, tazî û pêxwas, bi girîn û zarezar
 Keçen ciwan, bûkên salê nema gazî, nema hewar
 Wan xwîn rijandin bê qedar
 Cî û warê bav û kalan bû hêlinâ mişk û mar.

Wan bawer dikirin û digotin: „Me Bihişt ji xwe re kirî!“
 Xêmexwazên çavşor li wan dadigirtin meji û serî
 Şûr dihejandin û digotin: „Em in xwedîyêñ Bihiştê, Redwan e li ber derî!“
 Dijminên me Kurdan avakirin dewletên bi sinûr û qesrên mermérî
 Me bi hevdu re dikir şer û çeng û bereberî
 Mixabin, hêja berdewam dibe, ew bêmeji û xwelîserî.

Ew mirovên bi ol û erkan diterqiyan, ji wan difilitîn yek ji sedî
 Belav dibûn li şaristanan, hem bê kes man, hem bê xwedî
 Lê Tawîsi-Melek ma bawerî û bi han û hewar hat Şîxadî
 Wî hinir sitand ji Şêx-Şemsê mefer, gazî dikir bi zimanê kurdi:
 „Îzîdîno, Hûn bigrin welat, ji Amadê heyâ (bi) Cûdî.“

Hezar sal piştî ferman û wêranan dîsa dîrok xwe vedigerîne
 Hêja em ronahiyê didin welêt, dijmin ji me bi kerb û kîne
 Em gulên welêt in, xwedîyêñ Bagok, Şengal, Bişêrî û Lalişa Nûranî ne
 Em ne Cihû ne, ne file ne, ne misilman in û ne zerdeşti ne
 Em xwedîyêñ Qewl in, bi Berat in, bi pêşîr in û xwedîyêñ Kaniya-Sipî ne
 Em bi şêx in, bi pîr in, bi feqrîr in, bi koçek in, em in, em Îzîdî ne.

Sewqî Isa


Weşanên nû

Ola Ezidiyan

Endamê redaksiyona „Dengê Ezidiyan“ lêkolinvan Şewqi Îsa dê pirtûka xwe ya li ser ola Ezîdîtiyê bi zimanê almanî di demekî nêzik de biwesîne. Kovara Dengê Ezidiyan vî karê pîroz dike.

Die yezidsche Religion

Das in der letzten Ausgabe angekündigte Buch von Chaukeddin Issa über die yezidische Religion konnte aufgrund zu hoher Verlagskosten bisher nicht erscheinen. Die DÊ wird nunmehr die Produktion und den Vertrieb des Buches übernehmen. Issas Buch verschafft einen umfassenden und fundierten Überblick über das Yezidentum. Mit der Erscheinung wird im Frühjahr nächsten Jahres gerechnet.



Kovara Lalis

Bingeha Lalis li Dihokê, ji bo komelayeti û rewşenbîrî, hejmarên hefta û heşta yên kovara Lalis weşand û karên wê rîdaksiyonî her berdewam in. Ew ji bo çand û ola Ezîdîtiyê kar dike û semînar û civînê lêkolînvaniyê pêktîne. Kovara Lalis dikare li ser navnîşana redaksiyona DÊ bê xwestin.


ÊZİDYATI

Wane bo qutâbiyêt ezidya
î pôle 11-8 qunaxa seretay!




Dengê
Kovara
Pir Xidir Silêman

Lİ BIR ENİE İŞÇİLERİN BİC TA GİRENİ KURTE SAPERME



Kovara Roj

Bingeha Ezidiyan li Derveyî Welat (ÊZiA) heta niha 3 hejmara ya kovara „Roj“ weşand. Bizav û çalakiyên Bingeha Ezidiyan li Derveyî Welat (ÊZiA) berdewamin. Kovara Roj dikare li ser vê navnîşanê bê xwestin: Dr. Khalil J. Rashow, Hubeweg 6, 37574 Einbeck, Almanya.



Kovara Lalis - Dengê Yekîtiya Ezidiyan

Mala Ezidiyan li bajarê Sellê heyâ niha şes hejmarên kovara xwe „Lalis“ weşandine û kar û barê xwe didomînin. Ev kovar dikare li ser vê navnîşanê bê xwestin: Koppel 21a, 29227 Celle, Almanya.

Pirtûka Ezidiyatî


Mamoste Pîr Xidir Silêman pirtûka xwe „Ezîdîti“ bi tîpêñ latînî û erebî weşand û belav kir. Ev pirtûk ji bo dersê olî li dibistanêñ gundêñ Ezidiyan e. Zarokêñ Ezidiyan li gundê Baedrê, Şariya û Xanikê li Kurdistana Başûr dê dersêñ olî lî gor vê pirtûkê bigirin. Çend mamosteyên Ezîdî li gundê Başik û Behzanê ev pirtûk zarokêñ Ezidiyan didine xwendin û gavêñ baş û rind avîtine.

Religionsbuch für Kinder

Der Yeziden-Experte Khidir S. Khalil hat in kurdischer Sprache ein Religionsbuch zur Unterrichtung von Kindern herausgebracht. Das Buch kann über die DÊ-Redaktion bestellt werden.

Ji bo zanîna rastiya ola Ezidiyan


Zanyarê ola Ezidiyan Dr. Şêx Xelî Cindî pirtûkeke hêja li ser dîrok , ol û felsefa Ezidiyan di sala 1992 weşand. Her disa 2 pirtûkên biçük bi navê "Duha û durozêñ Ezidiyan" di sala 1997 hatine çapkirin. Ev pirtûk dikare li ser vê navnîşanê bê xwestin: Dr. Khalil J. Rashow, Hubeweg 6, 37574 Einbeck, Almanya.



Die Yeziden

Nachdem der Autor Ilhan Kizilhan in seinem ersten Buch "Der Sturz nach oben" sich mit der Psychologie der Kurden auseinandergesetzt hat, beschäftigt er sich in seinem neuesten Buch mit der Sozialpsychologie der Yeziden. Kizilhans Buch "Die Yeziden" zeigt auf, welche Auswirkungen die yezidische Lehre und Praxis auf die Psyche der Menschen hat.

Das Buch ist im Verlag medico international Frankfurt a. M. erschienen und umfaßt 283 Seiten. Bestellungen können direkt an medico gerichtet werden.



Karwan


Çirokeke di bergê kitêbeke navincî û pêkhatî ji 67 rûpelan ji nivîskar Campola (Emerê Çelîk) li sala 1995 hate çapkirin. Herçend nivîskarê me senga xwe bîbir daniye li ser nivîsên şanoya lê vê carê xwe berdaye meydana çîroka ji. Di vê çîrokê de her kurdekî bi rewşa gundiyan û hal û hewalê wan bi civatêwan, bi dan û standinê wan, bi karê êzingan, paleyê genim û dexl û dan agadar dike. Bi vê çîrokê xweşîyeke hînek dike dil û cigerê xwendevanan.

Eskerê Boyik



Duhayêñ Ezidiyan

Eskerê Boyik, kurdeki Ermenistanê ye. Ev pirtûka wi "Kulilkê Çiya" di sala 1972 li Rewanê çap bûye. Eskerê Boyik, qasi hin nivîskar û helbestvanên Kurdên Sovêtiyê di welat da (Kurdistanê da) ne hatiye bihistin. Çend helbestêni wi cara pêsin di Roja Welat û kovara Özgürlik yolu (Riya Azadi) da û bi wergera tirkî çap bûn û xwendekar gelek pê qayil bûn. Helbestêni Eskerê Boyik xwedi awaki xas in; dengê wan ewqas bilind nebe û gur xuya neke ji, geleki nerm, zelal û şirin in. Ev bi his û ramanêñ xurt û kûr xemiline.



Pirtûka Ola Ezidîtiyê

Zanyarê Ola Ezidîtiyê Hoşeng Biroka pirtûkek li ser „Ola Ezidîtiyê“ weşand. Naveroka vê pirtûkê li ser pirsgirêka navkirinê di Ezidîtiyê de: Tawisî Melek, Çarşema Sor û Mîtologiya ola Ezidîtiyê.



Şexan û Şexan Begî

Ev kitêb ji danan Pîr Xidir Silêman û Sedilla Şêxanî li sala 1988 li Bexdayê bi zimanê kurdi zaravê soranî hatiye çapkirin û 336 rûpelan dike. Naveroka kitêbê ev e: Kurte basekî dîroka Ezidiyan û ola wan, Mirgehêñ Ezidiyan û Mîrgeha Şêxan. Çend fermanêñ dijwar bi serê Ezidiyan hatin. Yek

Qublet

Qublet el bidor qubleta me ye
 Zimzim heca me ye
 Kaniya Sipî mora me ye
 Şêsim meferê me ye

Ji kitêba Êzidîyatî, P.X.

Sîrûda zarokan

Em in zarokên biçük
 Ciwan, paqîj û xwesik
 Li gel qebeqebea dengê kew
 Bi rohilatê radibin ji xew
 Pak dişon em dest û çav
 Li dê û bav dîkin silav
 Sivik dixwin taşteya xwe
 Dest davêjin çenten xwe
 Em diçine dibistanê
 Şêrgo, Zêrin û Gulistanê
 Berê xwe didin xwendegehê
 Ew bingeha zanîngehê.

Li wê ron dîkin nerma çavan
 Radîçinin tevnê ji devan
 Vedixwin ji kaniya zanînê
 Bi saya Xwedê û mamosteyê
 jînê
 Li wir fêr dibin tor û tebiêt
 Ew ji me re dîkin xweş nef' et
 Divê em bibin darêñ bergir
 ji mirovatiyê re bibin hogir.

Pîr Xidîr Silêman

Hevpeyvînek II ser olên Kurdistanê

Di roja 28.10.1997 an de hevpeyvînek di radiyoya almanî - Süddeutscher Rundfunk- de di navbera Profesor Dr. Carsten Colpe, Dr. Cemal Nebez, Mehmet Çeker û Şewqî Isa de pêk hat. Di vê hevpeyvîne de her çar mirrovên lêkolînvan di wê baweriyê de bûn, ku ola Êzidîtiyê oleke serbixwe ye û tucar ne beşek ji beşen İslâmê ye û dîroka Tawisî-Melek dîrokeke pir kevnar e. Rehêñ baweriyê bi hebûna Tawisî-Melek dîghijin heyâ bi 5000 sal.

Lêkolînvanê hêja mamosta Cemal Nebez giranbihabûna peydabûna Êzidîtiyê, Elewîtiyê, Ka-

kayiyê û Ehli-Heq di nav kurdan de anîbû ser ziman. Her wiha wî wisa digot, ku van her çar olên kevnar çand û zimanê gelê kurd li jiyanê hiştin. Û ji vê sedemê ji parti û rêxistinê kurdan guhda-neke baş li van olan dîkin û bi teybetî di vê dema dawî de. Wekî din ji van mirovan nêzîkbûna di navbera he çar olan zel-al kiribûn. Her sê lêkolînvanen kurd spasi Profesor Dr. C. Colpe dikirin, ku ew li gel emrê wî yê bilind û nexweşıya wî ya giran di vê hevpeyvîne de besdar bû. Berpirsyara vê bernamê ji rojnamevana almanî Hannelore Küchler bû.

Em cejna we ya Êzdî pîroz dîkin!

Bi hatin û nêzîkbûna cejna Êzî - Ezdayê pak - ya ku vê salê di roja 19.12.1997 an de ye, em pir dixweş û kîfxweş dibin.

Bi navê desteka nîvîsinê - rîdak-siyonê - ya govara DÊ em vê cejnê li we giştan pîroz dîkin û xêr û xweşîyê ji we re û ji gelên aştîwaz, xêrwxaz re dixwazin. Her wiha em hevidar in, ku ev cejin her sal bi xêr û xweşî li

Êzidxanê û dost û hevalên dil-pak derbas bibe û hindek êş û janên we sivik bike. Em aştî, bîratî, wekhevî, tifaq û tevayî, xêr û xweşî ji Êzidiyan û dosten Êzidiyan re dixwazin û dibêjin: "Ya Xwedê û Tawisî-Melek, tu li milleten dînyanê tevî werî rehmê em ji tevlî wan".

*Desteka nîvîsinê ya kovara
 Dengê Êzidiyan li Almaniya*

Book reviewing "Yezidism. Its background, observances and textual tradition"

A little while ago Mr. Philip Kreyenbrock published his book: „Yezidism. Its background, observances and textual tradition. The Edwin Mellen Press, USA, 1995,...“

It contains two enormous parts: Part one gives an exclusive account about the yezidi historical and religious background. It provides special informations concerning the beliefs, doctrines, co-

stoms and holy places. From his point of view as a scientist for studies in religion he compiled a very usefull working book. On the base of a special support and helps by Pir Xidîr Sileman, the author provides a rare overview more religious than a research in the yezidi society and its changes in modern times. As for the yezidis themselves he made a very important contribution to

collect the religious texts and to edit it as well as to spread it about all yezidi communities. At least it is an important native language document which can support studies in the Kurdish language. Finally the book by Pir Xidîr is a need and must for yezidis as well as for european scholars and scientists.

Sebastian Maisel

I m p r e s s u m

DENGÊ ÉZİDIYAN*International periodical to spread accurate knowledge about Yezidism*

Publisher/ Herausgeber/ Weşanvan	Verlag Dengê Ézidiyan Am Schießstand 6 26122 Oldenburg	Distribution and publication/ Vertrieb und Erscheinung/ Çap û weşan	Published once a year. International sales. Mainly: Germany, Iraq, Turkey, Syria, USA, Canada, France, Sweden / Internationaler Verkauf + Postvertrieb. Schwerpunkt: BRD, Irak, Türkei, Syrien, USA, Kanada, Frankreich, Schweden.
Editors/ Redaktion/ Rédaksiyon	Pir Khidir S. Khalil (Pîr Xidir Silêman), Telim Tolan, Chaukreddin Issa (Şewqî Isa), Badal Shamo (Bedel Feqrî Hecî)	Internet	http://yezidi.home.ml.org e-Mail: yezidi@aol.com
Production manager/ Produktionsleitung/ Çapkirina kovarê	Lars Eglitis		
Further staff/ Weitere Mitarbeiter/ Alikarên vê hejmarê	Sermet Dag, Sebastian Maisel, Thales, Necat, Leo Cordeiro, Mamoste Firat, Siyabend, Frank, Ali, Selim, Şükrûye, Mehmet, Ahmet, Muras, Firdaus, Murad, Hediye, Cengiz, Lazgin, Emin		This periodical and all contributions contained therein are protected by copyright. Any utilization outside the limits of copyright legislation without the express consent of the publisher and the author is prohibited. This applies in particular to reproductions, translations and storage of processing in electronic systems. Named articles do not represent the opinion of the publishers necessarily.
Cover-peacock/ Titelbild Pfau/ Wêneyê rûpelê pêşî	Şêx Lauffrey Nebo, Ézidi-Forschung, Münster		
Photo back page/ Foto Rückseite/ Wêneyê rûpelê dawî	Gisela Prieß (Yezidi graves of Hamduna/Yezidische Gräber von Hamduna)		Nachdruck von Fotografien, Texten und Grafiken nur mit ausdrücklicher, schriftlicher Genehmigung des Verlages und der Urheber gestattet.
Layout	Lars Eglitis		Für unverlangt eingesandtes Text- und Bildmaterial übernimmt die Redaktion keine Verantwortung. Wir behalten uns das Recht vor, eingereichte Artikel nach unserem Ermessens sinnwahr zu ändern oder zurückzuhalten. Namentlich gekennzeichnete Beiträge stimmen nicht unbedingt mit der Meinung der Redaktion überein.
German orthography/ Deutsche Orthografie/ Ortografiya almanî	Andreas Städter		
Bank account/ Bankverbindung Pewendîyên benkê	Oldenburgische Landesbank AG BLZ: 28020050 · Kto: 1267500500		Kopîkirin û çapkirina sûretan, gotaran û tiştêm grafikî bê destûra berpirsiyariya çapkirin û weşandinê qedexe ye. Ji gotar û sûretên nexwesi re em ne berpirsiyar in. Ji mafe me ye, ku em wan gotarên gihştine me û yên ji bo weşandinê ne, li gorî dîtina xwe biguhêrin bê ku mana wê gotarê bê guhrandin, anjî bi carekê re ne weşinin. Bi tenê nivîskar berpirsiyare nave roka gotara xwe ye. Ne şert e û ne pêwist e, ku bawerî û dîtinê nivîskar û yên rîdaksiyonê wek hev bin. Ev kovar bi pelên bê Klor katiye çapkirin.
Special thanks/ Besonderer Dank/ Sipasî	Ausländerbeauftragte des Landes Niedersachsen Frau G. Erpenbeck		

Temara Mirinê

Dil giribû, hiş ketibû xem û xeyalan
Dest şemirîn, qerem sist bûn, cokan erd dimalan
Min pê anî der, ku dimînim li paş hevalan
Lêv rihîlin, cav û ziman dabûne qîrîn û hewaran
Wey Felek xayîn, ev in nişanên mirina sar.

Guh giran bûn, çav ketibûne temorê
Kalekî ez radikirim liser piyan bi kote û zorê
Difirandim li scr bajaran, difiriyam raserî Torê
Min Qamişloka xwe dîtibû û gundên li dorê
Hêstir herikîn bi ser rondikan de, wey dayê korê.

Kalemêro! Tu min deyne ji xwe re bike xêr
Bihêle ez ji dîtina wî warê axşêrîn bibime têr

Dîsa serê berxê nêr bide ber kér
Ez bi hesreta dîtina şingal im û pêre Hewlêt.

Tu bide xatirê wan perên xwe yên keskîn
Min bide xatirê navê Tawîsî-Melekê şérîn
Min bibe ber mala pîroz: Lalişa zérîn
Bila ev daxwazî di dilê min de nemîn
Ji nû ve min qut bike ji vê dinyaka derewîn.

Êdî berê min bide aliyê welêt, aliyê bakur
Min deyne nêzîkî Otilceka ber ava kûr
Min xwestibû silav bidime pêşîmaman li wir
Nezîr jî li wê ye, çira xorîn Kurdistan ya gur.
Şewqî Şemo Isa

Qewlê Axretê

Nefse çendî tu dîkf gumanê
Tu xalî nabî ji xedrê û dixanê
Tê xeyala xwedanê xwe xilas bîkî ji imanê.

Çav bezîye serî
Dîl xwendekar e wê ï wi berî
Çav dibîne dîl dixwaze
Ziman dîbêje min dêwerî
Zimano xwezî mîn te kiribe ker bî kerî

Ey zimano yê xebat e
Xebera xweş nebat e
Xebera newxeş cî nîf et e
Dê diliê insanî pê bîkî rihe.

Hey zimano yê sotinê
Xeberek wa hey nayê gotinê
Dê boçî dahir bîkî ñ rûyê dinê.

Hinchiyê hikim dîke li zimanê xwe ye
Bizanibe wezna deng bikeye
Ne hewceyî çile û micade ye.